



Wêne: Rojnameya SÖZ

Sûcê Tirkîyeyê tescîl bû

Rüpel 3

Nûçeya Serdar Tajan:

**Li Washingtonê
Enstîtuya kurdî ava bû**

Rüpel 7

Hevpeyvîn bi Mihemed Elî Şakir re:

**'Hunereke qels jî
dikare di dilê gel de cih bigire'**

Rüpel 8-9

Metin Aksoy:

**Roja danîna
hîmê şoreşa kurd**

Rüpel 16

NAVEROK



Feqîr Ehmed: Bêdengî mirina rewşenbîr e

4



Dildar Şeko: Ji amûrên muzîkê yên jîdar: Çeng

10



M. Agirî: Şahiya bîranîna Melayê Cizîri

11

Ji Xwendevanan

EZËE behsa kelemê çavén komara tirk MED-TV'ye bikim.

Mirov carinan di televîzyon û rojnameyên tîrkan de rastî hinek nûçeyan tê, bala mirovan dîkîşîne. Min hetanî niha get nedît komara tirk bi tiştîkî ku kurd bikin, kîfxwes bûye. Her tim zivîrbûna xwe tînin ziman. Lî belê min rojekê dît ku rojnameyên tîrkan (hinekan) bi navê "Fisiltî TV" li ser MED-TV'ye nîvîşibûn. Bi taybetî wezîrekî tirk gotibû: "Li Tirkîyeyê du milyon însan li MED-TV'ye seyr dikan." Dîsa jî derewan din. Du milyon nîn e, deh milyon bigota belkî xwe ji derewan xelas bikira. Wazîr dom dike dibêje: "Hinek mirovên xîzan hene bîzîneke wan jî hebe difiroşin, axteneke peykan distînîn û li MED-TV'ye seyr dikan." Wezîr qet nabêje gelek cehş (qurucî), gelek serbaz û gelek tirk jî antenê peykan distînîn û li MED-TV temâse dikan. Wezîr qet nabêje em hemû wezîr, serokwezîr, serokkomar û mebûs jî li MED-TV'ye temâse dikan.

Ev dek û dolabê komarê jî me re ne ecêb in, yanê ne xerîb in. Digotin Newroz qedexe ye, xwîn rijandin, gelek mirov hê jî di zindanê de ne. Nihîri bi gel re serî dernakeve, Newroz xiste Nevrûz û serbest kir. Niha jî dixwaze MED-TV'ye bike GAP-TV. Komara Tirk her tiştî dide zora xwe, wexta pê re serî dernakeve, dibêje kurdo te qezenc kir.

ZEKİ BAZIDÎ

W

Hûnê hin tiştîn din jî li xwe deynin

MEHMET GEMSİZ

Roja duşemê (18.11.1996), di program "32. Gün"ê de nûçeyeke girîng û bi qasî wê jî balkêş, hate pêşkêşkirin. Nûçê li ser İspanyayê bû. İspanyayê rêtixtineke veşarî û ne-qanûnî ava kiribû û li hemberî ETA'yê bi kar anîbû.

Navê rêtixtina veşarî GAL bû. Wê tero-reke gemar û qilêrî li dijî dîlxwaz, xêrxwaz û mîltanê ETA'yê pêk anîbû. Endamên vê rêtixtinê, heta li derveyî İspanyayê operasyon kiribûn û carekê bi şâşî welatiyekî Fransayê jî revandibûn, lê pişt re ew berdabûn.

Bi vê şâşiyê, GAL'ê xwe dabû dest. Hêdî hêdî kîrinê vê rêtixtina hanê yêne wekî kuştin, revandin, işkence û bombekirin eşkere dibûn.

Belê, İspanyayê li dijî ETA'ya ku ji bo Herêma Baskê şer dikir, dest bi terorê kiribû.... Lî, rastî wekî tava rojê bi bêjingê nehatibû veşartin. Her tişt tip tazî derketi-bû rastê. Serokwezîr wê demê Felipe Gonzales jî ji rêtixtinê haydar bûye. Niha li İspanyayê mehkemeyen vê rêtixtina hâne didomin.

"GAL" a Tirkîyeyê jî, bi qezaya li Susurlukê xwe tam da dest, çendî ku berê geleb bûyerên failen wan wekî "nediyar" diha-

tin binavkirin, dewlet destnîşan dikirin jî.

Wezîr Karê Hundîrîn yê berê Mehmet Ağar, (berê jî Midurê Emniyetê yê Gişî bû) li xwe mikur hat û got: "Ji bo temînkirina hizûrê me hezar heb operasyon pêk anîn."

Mebest ji peyva "hezar"î pîrbûna operasyonê veşarî ye ku bi destê rêtixtina veşarî hatine kîrin. Ağar bi vê jî namîne û wiha dibêje: "Me ci kiribe ji bo mayîna dewletê kîrin. Ê ku bibêje min li ser navê dewletê ev tişt kîriye wisa li her derê napayive. Edî kes ji bo dewletê canê xwe navêye talûkeyê..."

Bi van gotinan "camêr" mesajê dide hin deveran. Di binê van gotinan de gefxwarin hene...

Hebûna rêtixtinê venâşêre, li xwe datîne ku tiştîkî wisa heye û wê jî bo "temîna hizûrê gelek tişt kîrine."

Mebûsê serbixwe İsmet Sezgin jî, ku hem serekiya meclîsê kîriye û hem jî Wezîr Karê Hundîrîn ê berê ye, diyar kir ku di nav dewletê de "dewletok" hene û evrewş jî, ji ihtiâsa Tansu Çiller û Mehmet Ağar qewimiye. Em bi bir bixin ku Sezgin ji DYP'ê veqetiyaye.

Serokê Gişî yê ANAP'ê Mesut Yılmaz

jî, tiştîn wisa gotin û niha jî dibêje. Vî camêri jî çend caran serokwezîrtî kîriye, bûye Wezîr Karê Derve jî. Ev her du kes jî hatine cihê mezin û bilind. Hema ci were ber devê wan nabêjin. Mirovdewleten Tirkiyeyê ne...

Sadık Avundukluoğlu, dadixuyîne ku di reweke ku hiqûq serdest be ne mim-kûn e kesen wekî Tansu Çiller bibin wezîr. Ev kes jî mebûsekî DYP'ê bû. Vê ga-vê na. Di sala 1993'yan de, li meclîsê Komîsyona Lîgerînê ya Cinayetîn Faîlîn Meçhûl hatibû sazkarin. Ew jî serokê wê komîsyonê bû. Komîsyonê dest bi lêkolîn û lêgerînê xwe kiribû. Piş re jî raporek amade kiribû. Tê de hin idayê wisa hebûn ku hin kes şoke kiribûn. Komîsyonê di raporê de bal dîkîşande ser kîrinê ne-qanûnî û nelirê ku haya dewletê ji wan heye û heta wan diparêze jî.

Heta ekere dikirin ku wezîfedarên dewletê ji dêla ku ji wan re bibine alîkar rî li ber wan girtine.

Rapora komîsyonê jî bi behaneyâ "te-mamnebûna îmzeyan" neketibû rojeva meclîsê.

Qezaya li Susurlukê bû sedema eşke-rebûna "GAL" a Tirkîyeyê. Berpirsên ji vê rêtixtina tarî û kirêt, li xwe datînin ku bi wê rêtixtinê ji bo "bekaya welat" operasyonê ne-qanûnî pêk anîne û wan kîrinan jî diparêzin.

Li İspanyayê serokwezîr wê demê jî tê de, gelek rayedar û wezîfedar niha hesab didin. Wan jî, ji bo mayîna welat kîrina her tişt mubah dîtibûn...

Sê kulîlk: Zîlan, Rewşen, Bermal

IZETTİN DILBİRİN

Rûmet û jiyana welatê rojê û mirovatiyê, tu car lehengî û cengaweriya te û hevalên te nayê jîbîrkirin. Tu kes nikare li hemberî mirovatiya ku we da jiyandin serê xwe rake, ji ber ku we ji nû ve tîrêjîn ronahîya ku ji welatê rojê derketin, li ber şewqa wan findan we şitîn rîhanê av dan bi xwîna xwe. Belê jîyan çiqas xwe e, lê ku mirov bi-jî û bide jiyandin, gelo ku mirov bifikire jîyanî ku we daye mirovatiyê çiqas birûmet e. We jîyan baş nas kiribû.

Lê xwînmij û xwînxwaran hê jî nîzanibûn ku tovîn jîyanê, hûnê li nav wan jî belav bikin. Tîrsa wan jî ev bû ku hûnê di dilê wan de bibin wek agir û şewatê, nîzanibûn ku hûnê bibin melhema birîna mazlûman û ronahîya li peşîya gelê kurd û mirovatiyê.

Ew bîr û baweriya we ya ku hûn bi jîyanê ve giradabûn ji mirovên ku mirovatiyê dixwestin re banga azadî û serxwabûn bû. Ev bang, ji hemû welatparê û xwedîyê mirovatiyê re bû. Lî di serî de kesî nedizanî ku tîrêjîke rojê, ji serê çiyayê welatê rojê û ji nav refen şervanîn cenga azadiyeke birûmet konêpeçayı dîyanî ser milêن xwe û bi rî ketiye. Ew hatibû serê çiyayê Munzur ku rasefî bajarê Dêrsimê ne, wê tîrêjîke rojê biryar girtibû ku kulîlkîn welatê xwe av bide bi jîyanî ku diherike ji kaniya dilan. Ji wê yekê jî, wê dixwest ku riya jîyanê

Ew hersê tîrêjîn ronahîyê her yek bi rengekî bû. Lî bi hev ve girêdayîbûn û yek ji wan kevokên aştiyê jî vê carê berê xwe dabû hêleke din û hêdî hêdî kelemîn darê gulan vedibûn, ew meydanîn cengê bi kulîlkîn rengîn dixemilandin

nîşanî gelê xwe û mirovên aştiywaz bi-de. Lewre jî bi rî ketibû. Yek ji wan gu-lênen bi bêhn qehremana hêja şervana azadiyê û berxwedana jîyanê û rewşa mirovatiyê bû. Navê wê kulîlkâ wekî qozegerê, Zîlan (Zeynep Kinaci) bû. Wê hevalê ronahîya xwe dabû ser Dêrsimê, bûbû kelem di çavén neyar de û bûbû şûr ketibû li ser dilê dijmin ku ji welatê rojê qirêja bi hezar salan rake. Dem hatibû. Dijmin edî ketibû xewa gemarî kî dizanî gelo ku xweşîya wê ronahîyê wê gulênen aştiyê li wê meydanî û çavén wan xwînxwaran, wê li ber mij û morana wan gulênen aştiyê kor bibe.

Wê ronahîyê hêdî hêdî xatirê xwe dixwest ji mirinê û ketibû riya jîyanê û gîhiştibû bér koma dijmin û nefreta bi hezar salan di nav çavén xwînxwaran de verîsandibû. Li hêla din tîrêja din dimeşîya, lê edî deriyen hesin xwe li ber hêrsa wan û nîrînên wan nedigirtin, diheliyan wekî berfa li zozanê Serhedê. Çend meh derbas bûbûn, edî kevokên din gîhiştibûn qonaxa xwe. Yek ji wan gulan jî, ku bi rengê wan rîhanên din xwe xemilandibû li bajarê Edenevê xwe kiribû sembola ciwanê Kurdistanê û hemû cihanê. Ew leheng hevala Rewşen (Leyla Kaplan) bû ku, li bajarê Edenevê

bi jîyanê şâ bûbû, gulênen kesk li wan ko-lanîn bajêr belavkirf bûn û dabûn destê mazlûman û jîyan bi wan dida naskirin.

Ew hersê tîrêjîn ronahîyê her yek bi rengekî bû. Lî bi hev ve girêdayîbûn û yek ji wan kevokên aştiyê jî vê carê berê xwe dabû hêleke din û hêdî hêdî kelemîn darê gulan vedibûn, ew meydanîn cengê bi kulîlkîn rengîn dixemilandin û hevokên aştiyê difirandin di wan meydanîn şer de.

'Wan helbesten jîyanê digotin û dimeşîyan û beza sisiyan jî, gîhiştibû bajarê Sêwazê. Edî wexta gulan hatibû ku bigî-hin armanca xwe û kulîlkîn xwe bipi-kivîn angò xwe bigîhîn jîyanâ bêda-wî birûmet.

Belê; ew hersê gulênen bi bêhn wiha bûn wekî dara jîyanê. Her wekî çawa ku dar li ber kaniya heyatê sê çiqlênen xwe bi ser avê de siya xwe berdin, wisa siya xwe berdabûn ser gelên mazlûm û we-latê rojê û ew di hembêza xwe de didan jîyandin. Wan digotin: "Em ronahîya welatê rojê û hêviya gelê bindest in". Belê; gula sisiyan jî hevala Bermal (Güler Otaç) bû. Wê li Sêwazê bêhnâ xwe dabû hemû cihanê û Kurdistanê xatir ji mirinê xwestibû û di bin konê jîyanê de edî dimeşîya.



KOMİTEYA Mafen Mirovan ên Kurd (MAF) li Sûriyê bi munasebeta salvegera 34'an a serjimara taybet ku li Parêzgeha Hesekê pêk hat, belavokek belav kir. Vê serjimarê 100 hezar kurd ji mafê welaîtiyâ Sûriyê bêpar hiştibû. Her wişa ev kurdên bênasname ku fro hejmara wan bi ser du sed hezaran ketiye, nikarin bi serbestî ji bajarekî herin bajarekî din, nikarin bibin xwedî mal û ji hemû dam û dezgehêne dewletê bêpar in. Dîsa tê gotin ku, cihê ku bi sed salan kurd lê dijîn, bi firehiya 10 km'yi û bi dirêjiya 370 km'yi, ango ji rojhîlatê bajarê Serêkaniyê heta bi Dêrika Endîwerê, di bin navê 'Hîzam'ê (dorpêkirinê) de siyaseta şovenîst a erekirinê lê tê meşandin.



RÊXISTINA Efûyê ya Navneteweyî (AI) bi munasebeta "Roja Zarokan" di 20'ê sermawezê de raporek weşand. Di vê raporê de Tirkîye bi işkencikirina zarakan tê súcdarkirin. Rapor diyar dike ku polisêne tirk bi metodê weki şoka elekrikê, liberhiştina ava sar a şîdayî (bitazîyîk) işkenciyê li zarokên 12 salf dîkin. Her wiha di raporê de çeli windakirin û kuştina zarakan jî tê kirin.

Di rapora Al'yê de vegotinê zarokekî 12 salf jî cih digirin. İşkenciyê ku li wî zarokî bûye, bi belgeyên tîbi hatiye selmandin. Bûyeren bi vî rengî di raporê de gelek in, lê dîsa jî rayedarên tirk van súcan napejirin û Rêxistîna Efûyê bi layangiriye tawanbar dîkin.

NÛÇE

Sûcê Tirkîyeyê tescîl bû

Parêzer Osman Baydemir: Mafen mirovan û Tirkîye

Pişti şerê duyemîn ê cîhanê, mafen mirovan gîhîst asteke rîkxistî û ji sînorênet neteweyî bîhûrî, bû mijareke navneteweyî.

Di Berfanbara 1948'an de Danezana Mafen Mirovan a Gerdûnî hate daxuyandin. Paşê di 5'ê gulana 1949'an de Konseya Mafen Mirovan a Ewrûpayê ava bû û hinek xebatêne wê pêk hatin. Weki ençama van xebatan di 4'ê sermawezâ 1950'yi de Peymana Mafen Mirovan a Ewrûpayê hate ïmzekirin.

Komara Tirk ji serî heta dawiyê di nava çalakiyên amadehî yêne peymanê de cih girt û di nav 12 dewletêne ku pêşî peyman ïmze kirin de, cih girt. Di adara 1954'an de Tirkîye kete bin bandora vê peymanê.

Ev peyman ji 66 madeyan pêk hatiye. Di madeyê 2 û 14'an de 12 mafen bingehîn ên mirovî cih digirin. Di Zagona Bingehîn a Tirkîyeyê de jî qala van mafan hatiye kirin. Madeyê 24 û 25'an mafê serîlêdanê saz dîkin. Madeya 24'an qala serîlêdana dewletan, a 25'an jî qala serîlêdana şexsî dike.

Taybetiya vê peymanê ya serekî, nasîna mafê serîlêdanê ji bo kesan e. Heta sala 1995'an, 30 dewletan ev maf daye welatiyên xwe. Tirkîyeyê di 28'ê rîbendana 1987'an de ev made ïmze kir û ev maf nas kir ji bo welatiyên xwe.

Madeya 25'an mafê serîlêdanê di gel welatiyan dide kesen biyan, penaber, bêdewlet, bindest, rîxistinê sîvîl û mafen mirovan jî. Madeya 96'an a Zagona Bingehîn dide zanîn ku hukmê peymanen navneteweyî bi qasî Zagona Bingehîn e. Lî li gorî hinek hiqûqnasen ew di ser wê re ne, ji ber ku betalkirina van nayê xwes-tin heke ew bi Zagona Bingehîn re li hev nekin.

Heta 1995'an ji Tirkîyeyê 850 serîlêdan çûne Komîsyona Mafen Mirovan a Ewrûpayê. Ji van 95 dosya hêjayî lêkolînê hatîne dîtin, 260 dosya hatine redkirin. Tirkîyeyê ji bo 345'an ifade daye. Heta niha 25 serîlêdan jî li dijî xala 8'an a Zagona Antî-Terorê çûne ber destê komîsyonê, lê Tirkîyeyê tu bersiv nedaye van dosyayen. Ji dosyayen ku çûne komîsyonê 10 heb gihiştine çareseriya dostane. Niha, li dora 1500 dozêni li dijî Tirkîyeyê li ber destê komîsyonê ne.

Rewşa ku dewleta tirk ketiyê, rayedarên dewletê bêhtir tengav dike û dibe sedem ku ew bi daxuyaniyên xwe rewşê xerabtir bikin. Bo nimûne roja 14'ê sermawezê daxuyaniyeye Wezîrê Edaletê Şevket Kazan di rojnameyên tirk de derket. Di vê daxuyaniyê de Kazan mafparêzen kurd û ïngiliz súdar dike.

Dewleta tirk cihê ku ji Afrîkaya Başûr vala bûye, dadigire." Xuyanga Tirkîyeyê ya li derive, vê gotinê tîne bîra geleksan. Bi sedan dosyayen li dijî Tirkîyeyê niha li ber destê Komîsyona Mafen Mirovan a Ewrûpayê ye. Di dozkekê (gundê Kelekçi) de Dadgeha Mafen Mirovan a Ewrûpayê Tirkîye súcdar kir. Ev doz bi gotina Serokê Projeya Mafen Mirovan a Kurd (KHRP) 3 milyon însanê kurd eleqedar dike, ji ber ku dibe emsal ji wan re.

Ji bilî vê, li Parlementoya Ewrûpayê ji sosyalîstan heta muhafazakaran baweriya kesî bi Tirkîyeyê, bî taybetî ji bi Tansu Çillerê nemaye. Bo nimûne; roja 14'ê sermawezê de rojnameyî Turkish Daily Newsê de nûçeyek derket. Di vê nûçeyê de Endarmê Koma Muhabazakar a Parlementoya Ewrûpayê James Moorhouse dide zanîn ku di parlementoyê de êdî hurmeta kesî ji Tansu Çillerê re nemaye. Ew dibêje: "Çiller di parlementoyê de naveki kirêt e." Li gorî texmîna wî, wê havê Tirkîyeyê ji ber kirinê li derveyî mirovahiyê, bikeve listeya welatên ku bi diktatorî tê idarekirin.


Wekî ku kampanyaya Rêxistina Efûyê ne bes be, li ïngilistanê jî hin rîxistinê sîvîl li dijî Tirkîyeyê dest bi boykota tûrîzmê kirin. Sedema vê boykotê ji disa mafen mirovan û kêşeya kurdiye. Ew kampanya li dijî kampanyaya 41 şîrketên tirk pêk tê.



Di kampanyaya boykotê de digel meş û belavkirina belavokan, filmekî ku kirinê Tirkîyeyê nîşan dide di ITV'ye de derket. Her wiha rojnameya "Ethical Consumer" jî dî nava 36 bangevânê kampanyayê de cih girtiye.

Rewşa ku dewleta tirk ketiyê, rayedarên dewletê bêhtir tengav dike û dibe sedem ku ew bi daxuyaniyên xwe rewşê xerabtir bikin. Bo nimûne roja 14'ê sermawezê daxuyaniyeye Wezîrê Edaletê Şevket Kazan di rojnameyên tirk de derket. Li gorî Kazan 300 parêzerên Amedê kaxizên vala bi mirovan didin ïmzekirin, bi alîkariya kesekî bi navê Kerim û parêzerên ïngiliz dosyayen xeyâlî dîbin Komîsyona Mafen Mirovan a Ewrûpayê. Kesen ku muhatabê vê daxuyaniyê ne, gotinê Kazan weki bêsiûdiyekê bi nav dîkin. Serokê Projeya Mafen Mirovan Kerim Yıldız dide zanîn ku wî dîtinê xwe bi nameyekê ragihandiye Şevket Kazan û her wiha ewê li mafê xwe jî bigere. Yıldız der barê KHRP'ê de jî hinek agahiyan di de û diyar dike ku car caran bi Tirkîyeyê re jî dan û standinê wan çêbûne. Tê daxuyandin ku KHRP weqfek e, li gorî zagonê ïngilistanê hatiye damezirandin û digel Yekîtiya Baro-yen ïngilistanê, Yekîtiya Mafen Mirovan a ïngilistanê û Hiqûqzanê Amerikayê projeyan pêk tîne, weşan derdixe.

Li aliye din ji rîveberen IHD'ya Amedê, Parêzer Osman Baydemir jî



gotinê Kazan bêbingeh dibîne û hinekî bi kêmâgahiya wî ve girê dide. Baydemir dide zanîn ku hemû formen serlêdanai, di arşîva IHD'ye de yesartî ne. Li aliye din Parêzer Baydemir diyar dike ku bi tenê du parêzer alîkariya hiqûqî didin kesen ku dixwazin serî li Komîsyona Mafen Mirovan a Ewrûpayê bidin. Baydemir wiha gotina xwe didomîne: "Xweziya 300 parêzer bi van dozan re eleqedar bûbûna, bi tenê ez û Mahmut Şakar bi van dozan re eleqedar dîbin." Parêzer Osman Baydemir bi bir dixe ku li herêma kurdan 3 hezar gund hatine şewitandin, bi sedan mirov hatine kuştin, mirov 30 roj di binçav de dimînin û işkenciyê xedâr dîbinin. Serokê KHRP'ê Kerim Yıldız dide zanîn ku di dema darizandîne de, heyeta komîsyonê tê Tirkîyeyê, li kesen eleqedar guhdarî dike, di wan de leşker û dozgerên tirk jî he-ne. Li aliye din Baydemir mînaka Ze-ki Aksoy bi bir dixe ku, pişti serîlêdanê li Amedê bi destê hêzên kontrayî hatiye kuştin.

Her wiha Serokê Projeya Mafen Mirovan a Kurd Kerim Yıldız dibêje: "Heke Komîsyon û Dadgeha Mafen Mirovan ên Ewrûpayê alîgir bin û Tirkîye wê bîryarêne dagehê nas neke, ci karê wê li Konseya Mafen Mirovan a Ewrûpayê heye." Weki encam, Kerim Yıldız dibêje: "Kêseya kurd êdî gihiştîye radeya çareseriye".

SAMÎ BERBANG

Bêdengî mirina rewşenbîr e

Di dema iro de çekhildan
ji gelê me re şanaziyeke
mezin û bilind e.

Lê bi tenê çek-teqandin,
ne rizgariya gelê Kurdistanê
ye. Lewma gere nivîskar
pênuşa xwe li hemberî
dijminan bikin bombeya
atomê û bi kar bînîn.
Ev teqandina bombeya
atomê jî, li ser milên
nivîskaran bûye bar.

Dema nivîskar bêdeng bimînin,
bi rastî mirina rewşenbîran e.
Ku nivîskar peyama nivîsên
xwe pêk bînîn, pêwist e bêdeng
nemînin. Ku nivîskar karibin rîceke
nûjen ji rizgariya gelê xwe re pêk bînîn,
binivîsînin û bi gelê xwe bidin zanîn,
wê demê pêwist e ku nivîskar di mala
xwe de rûnenin û bêdeng nemînin.

Lê ku nivîsar nikaribin bi pênuşa
xwe berhemên nû û nûjen jî çêbikin û
bi kar bînîn, dîsa jî pêwist e nivîskar di
navâ hêzeke kurdistanî de şûna xwe bi-
ginin.

Iro şertîn Kurdistanê pir û pir giran
in, her nivîskar nikare bibe welatparêz.
Gelê Kurdistanê di bin destê dijminen
xwînxwar de tê pelçiqandin. Dîsa jî gelê
Kurdistanê bi cesareteke mezin li
hemberî dijminen hov û dîn serê xwe
hildaye û ketiye şerê mirin û mayinê.
Ev jî, rastiyeye mezin e ku êdi gelê
Kurdistanê naxwaze bibe koleyê tirk,
ereb û eceman. Di vê sedsalê de gelê
Kurdistanê dixwaze jîna li gorî dilê
xwe, di welatê xwe de derbas bike.

Di roja iro de bi alîkariya xayînen
Kurdistanê, dijmin her roj sed miroj ji
gelê me dikuje û dipelçiqîne. Pêwist e
nivîskarîn Kurdistanê bêalfî nemînin.
Bêalîmayîna rewşenbîr di vê demê de
wekî cihgirtina li cem dijminan, tê hes-
sibandin. Di van êş û pelçiqandina gelê
Kurdistanê de, rewşenbîr û zana nikarîn
bêdeng bimînin. Di rewşa iro de pê-
wist e zana û ronakbîrîn Kurdistanê jî,
barê gelê xwe bi gelê xwe re hilde ser
milên xwe û li hemberî dijminen
xwînxwar şer bikin.

Rewşenbîran, bi ci awayî dibin bila
bibin, tu carî zilm û zoriyê qebûl neki-
rine û nakin.

Nivîskar, bi gelê xwe xwedî şexsiyet
e. Nivîskarîn Kurdistanê ji bo rizgariya
Kurdistanê pênuşa xwe pir kêm bi kar
anîne. Dost û dijminen gelê Kurdistanê
bi rîndî û xerabî raberî gelê xwe-neki-
rine. Di vê demê de girîng e gelê kurd
dost û dijminen xwe baş nas bike. Ev
kar jî dikeve ser piştâ nivîskaran. Dij-
minen gelê me xayînen Kurdistanê da-



ne pêşıya xwe, li me digerin. Me dibî-
nin, digirin, dikine binê zîndanan û di
binê zîndanan de bi lêdan û işkenceyan
şoreshgerêne me û gelê me qetil dinin.
Mal û gündê Kurdistanê bombardû-
man dîkin. Milkê gelê kurd li ser xayî-
nan tapo dîkin. Namûsa gelê kurd bi
destê xayînan paymal kirine û dîkin

Ku rewşenbîren Kurdistanê van xayî-
nan bi gelê xwe naskirin bidana, iro
ev tiştîn ku têne serê me kurdan pir ne-
dibûn. Bi sedan xayînen wekî Necmet-
tin Cevheri, Kamran Înan û Hikmet Çe-
tin bi rayêne gelê kurd çûne parlemento-
yê.

Bi ya min rewşenbîr hosteyê gelê
xwe ye, bi ya min rewşenbîr doktorê
gelê xwe ye. Ev doktorên Kurdistanê
girîng e tûrê xwe yî dermanan biavêjin
milên xwe û biçine nav gelê xwe. Gelê
Kurdistanê pir û pir nexweş e. Ji bo ku
gel ji birîn û derdan xelas bibe, girîng e
doktor biçin van birîn û derdan derman
bikin. Ku nivîskar gelê me hişyar bike,
wê gelê me jî ji birîn û derdan xelas bibe.
Dema ku ji birîn û derdan xelas bû,
wê demê gel ji bo jiyanek xweş hêz
dide xwe û gavêne mezin dikare biavêje.
Bi vê, pêşveçûn çêdibe.

Nivîskarîn tirk, ereb û ecem ji yên
me cuda ne, ew karin tiştîn vala jî bini-
vîsin, lê nivîskarîn me mecbûr in li ser
doza gelê xwe yî bindest û perîşan ji bo
azadî û aştiyê binivîsin. Ez nabêjim bi-
la nivîskar li sér çanda xwe xebatê ne-
kin. Ku nivîskar li çanda xwe xwedî
dernekevin wê demê dijmin çanda me
ji me didizin û dikine malê xwe, lê ni-
vîskarîn Kurdistanê heta di nava gelê
xwe de nas nebin, nabin xwedî şexsiyet
û rûmet.

Dema ku nivîskarîn Kurdistanê di
navâ gelê xwe de hatin naskirin, wê demê
dibin xwedî şexsiyet. Dema ku bû-
ne xwedî şexsiyet û xwedî gel, li cîhan-
în jî têne naskirin. Wê demê jî mezin û
bişexsiyet dibin û dikarin doza gelê
xwe bi cîhanî bidin naskirin.

Lê di roja iro de, nivîskarîn Kurdistanê hîn jî, şexsiyeteke mezin û bilindji
gelê xwe nestandine. Nivîskarîn me di
vê roja tehlî tarî de nikare bêdeng bimîne.
Divê ew bi gelê xwe re li hemberî dijminen
xwînxwar, xwe biavêjin şer-
rê azadî û aştiyê. Her wisa nivîskar,
di vê karibe komel û partiyê Kurdistanê
jî, bi rastî û bi cesaret rexne bikin. Wan
bi rîndî û xerabî raberî gelê xwe bikin.

Di dema iro de çekhildan ji gelê me
re şanaziyeke mezin û bilind e. Lê bi
tenê çek-teqandin, ne rizgariya gelê
Kurdistanê ye. Lewma gere nivîskar
pênuşa xwe li hemberî dijminan bikin
bombeya atomê û bi kar bînîn. Ev
teqandina bombeyê jî, li ser milên nivî-
skaran bûye bar.

Xêz: Nihat Turk

FEQÎR EHMET

Zimanê xweserî zarokan

Ev mijara hanê, yanê zimanê xweserî zarokan serê çend salan e ku bala min dikişand. Di zimanê gelên din de ev yek heye nîn e ez nizanim. Ji bo hînbûnê jî ez bi pey vê yekê neketim. Tiştê ku ez pê dizanîm di zimanê tirkî de zimanekî xweserî zarokan nîn e. Tenê du – sê peyvîn wan he-ne.

Digel vê rewşê, hemen hemen di hemû zimanan de ji bo zimanê zarokan metodek tê bikaranîn. Di peyvê de dengek li dengekî din tê guhartin û peyvê wisa, gava ku bi pitik û zarokan şad dibin, bi kar tînin.

Em çend mînakân pêşkêş bikin. Pêşî wekî ku çawa tê bilêvkirin em dê wisa binivîsin û pişt re jî di nav kevanê de awayê wê rast binivîsin.

Haj te la (ha ji te ra), *ka mi la* (ka ji min ra), *ez qulbana te bim* (ez bi qurba-na te bibim), *wele ba mi* (were ba min). Di van nimûneyan de tê dîtin ku dengê “r”yê li “l”yê hatiyé guhartin û wisa zimanekî ku tenê ji bo zarokan tê bikaranîn hatiye afirandin.

Piştî van agahî û daxuyaniyan, em vejerin ser mijara xwe ya himî. Me di serî de got ku, di zimanê me de ji bo pitik û zarokan zimanekî xweser heye.

Ji wî zimanî, me bîst peyv, ku di pratikê de pirtir tê bikaranîn, hilda dest. Em dê wan yeko yeko ligel şrove û raverkirina wan bi awayê alfabetik pêşkêş bikin. Ligel vê em dê bi eslîn wan ve gi-rehdahî bimînin.

Akirin: Gava zarok di xew re dikin “ake” an jî “lalike” û “ileke” ke dibê-jin.

Beho, biho: Navê kêzik, mês û rawi-

ran e. Wan ray û nîşanî zarokan dîkin û dibêjin; *üüü beho ye...*

Biv, ciz: Tiştê ku ji bo zarok talûke û xetere ne wekî agir, ji wan re biv tê gotin. Çaxa zarok ber bi yekî ji wan diçe, tafîlê ji devê ferdekî malê ev peyva biv an jî ciz derdikeve. Em nimûneyekê jî bidin: *Meşe biv e.*

Çaço: Ji bo çav e.

Çaço pij: Çaxa bixwazin zarok bixa-pînin bi kar tînin. Em bibêjin şekir nîşanî zarok kîrin û gotinê “Ha te la kaka” û wî/wê jî destê xwe dirêj kirê, wê gavê şekir bi paş ve tê kişandin û “Çaço pij” tê gotin.

Çiqê, tehê: Ci gava kesek xwe ji ber zarok veşere û ji nişka ve derkete berê, ji van peyvan yek tê bikaranîn.

Çûçêkirin: Rûniştin. Gava ku bê xwestin zarok rûne, jê re “Çûçê ke” tê gotin.

Eçêkirin: Lêdan, lêxistin, hingaftin... Gava ji zarok bê xwestin ku li filan kesî an bêvan tiştî bixe, “Eçê ke” jê re tê gotin.

Emkirin: Di cihê xwarinê de ev peyv tê bikaranîn, ji dêla “bixwe” de “Em ke” tê gotin.

Epo, fofo: Navê xwarinê ye. Nimûne: *Epo (an jî fofo) jê re binin...*

Ey ke, eyê ke: Ev, ji bo ku zarok des-tava xwe ya mezin bike tê bikaranîn. Zarok didin ser piyêñ xwe û jê re “Ey ke an jî eyê ke” dibêjin.

Kaka: Navê tiştê xwarinê ne. Wekî gûz, şekir nok, leblebi û tiştê wisa.

Kix, ey: Ji bo tiştê pîs û nepaqîjî tê bikaranîn. Em ferz bikin, zarok dest av-ête tiştîkî pîs an jî ew kire devê xwe “Kix an jî ey”, tê gotin.

Larolaro: Ji bo tiştê ku zarok ji xwe re bi wan dileyizin tê gotin. Laro jî dibê-jin.

Lûlokirin: Kesek (kî dibe ew zane) zarok dide ser piyêñ xwe û ji bo ku mîza xwe bike “Lûlû ... an jî, lûlo ke” tê gotin.

Meme: Di şûna avê de tê bikaranîn.

Pepo: Navê pê û ling e.

Tena: Zarok radikin ser piyan, bi her du destê wî/wê digirin û ji bo ku li ser piyêñ xwe bisikine, hem hêdi hêdi desten wî/wê berdidin û hem jî peyva “te-na” bi kar tînin, wekî: *Tena tena tena...*

Teto: Ji bo dest tê gotin.

Tûto: Ev nav ji bo heywanê bi bask û firende tê bikaranîn. Wekî çivik û mi-rîşkan.

Em vê jî bidin xuyakirin ku hemû peyvîn zimanê xweserî zarokan ne ev in. Me tenê xwest bi van mînakân em behs ji vî zimanê bikin.

Her wiha li gorî nêr û mîbûna peyvê, ya herfa “e” ya jî herfa “o”yê li paşıya peyvê tê danîn û wisa ew tê bikaranîn. Nimûne: ji bo por “poro”, ji bo serî “sero”, ji bo xûç (yanê xwişk) “xûçê” û hwd...

Ji aliye din ev mînak, yanê ev bîst peyvîn hanê, ji herêma Farqînî hatineberhevkin. Baweriya min ev e ku di vî warî de cihêtiyek jî di nav herêman de heye.

Daxwaza min ew e ku kesen din jî li ser vî warî binivîsin û hêdi hêdi be jî, ferhengokeke delalok a zimanê zarokan çêbe û dê û bav, xwişk û bira û hwd. bi wan peyv û gotinan bi pitik û zarokan şad bibin.

ZANA FARQÎNÎ

**i zimanê me de
zimanê xweserî
zarokan dibe
ku bala kesan
kişandibe ser
xwe. Ê min bi xwe serê
çend salan e ku
dêhna min kişandiye.
Ev ziman jî, hemâ bibêjin
êdî li bajaran li ber mirinê
ye. Çawa gere em nehêlin
tu jêmayî û bermahiyê
me, nirx û hêjahiyê
me wî
winda bibin û ji bo wan em
dest bibin xwe, a wisa jî
hewceyî bi berhevkin û
çêkirina ferhengokeke wî
zimanî xweser heye.**

Mebesta nîjadperestan tevkujiya kurdan e

CELALETTİN YÖYLER



Belê bi rastî mebesta wan, tevkujiya gelê kurd e. Lewre ev êrîşen wan wê mebesta wan derfîne ber çavên her kesî yê ku hinekî bi his be. Gelo çima ev mebesta hanê ya hovane û dirende di serê wan êrîşkeran de derbas dibe? Ji ber ku dagirker in. Ê jixwe dagirkeren nîjadperest rewşa wan ev e. Lewre ji bilî xwe tu gel û nîjadî naejirînîn û naxwazin ku bibine xwedî û xwedanê tu mañî.

Ev e rewş û mebesta nîjadperestiya hovane ya êrîşker, li ser sazî û rîxistinê demokrat. Nemaze li ser girtiyê kurd û şoresgerên tirk. Bi taybetî li ser Girtîgeha Amedê û kuştina deh dilên bêçek û bêparêz. Ev êrîşha hanê, êrîşke ne bi serê xwe û kesanî (şexsî) ye, her bi rîxistin û sazî ye. Belê wisan e û ji aliye saziyeke fermî ve, tê

fermankirin û êrîş tê kîrin. Wekî êrîşha li ser Girtîgeha Amedê, bi erebeyên ku bi pencereyên wan bi perdeyên reş nuxamî bûne hatine. Lêdanê wan ên li girtiyâ jî bi şîşan û daran, bi mebesta mîjîteqandinê çêbûye.

Ev êrîşen li ser girtîgehan, rewşenbîran, welatparêz û xwenasan dinimîn ku mebesta êrîşkeran tevkuji ye. Gelo bi çi rewş tevkuji? Bi mebesta ku mîjîye gelê kurd belav bike û doza wî ya neteweyî ya jî bo jiyanek serbest bide vemirandin.

Lê ev mebesta nîjadperestî ya hovane, tu demê bi ser nakeve. Ji ber ku bi kuştinan tu gel û netewe neqeliyane û neqediyane, lê her bi kuştinan aj dane û aj didin. Bi rastî rewş ev e, mînakân biserneketina vê mebesta xerab di dîroka cîhanê de gelek in. Wekî êrîşha nîjadperestiya “nazîyen Hîtlerî” wekî nîjadperestiya gomlekreşen Musolonî wekî ya nîjadperesten Afrîqaya Başûr li ser reşikan. Ev êrîşen nîjadî ji aliye raya giştî demokratîn cîhanê ve hatine şermezarkirin, rexnekirin, naletkirin û negîhiştine encamên xwe yên gemarî, têk çûne. Ev dîtin û rastiyen dîrokîne. Pêwist e, kesen ku xwedanê bîr û baw-

eriyan nîjadperestî ne, van gemariyê dîrokî yê nîjadperestî di bîra xwe binin û dest ji wan kîrinê gemarî berdin; ew biratiya gelan û neteweyan bivên û bi peyvîn. Lê eger ew ku dîroka gemariya nîjadiyâ neyînî/negatif/ a çepel di ber çavê xwe re derbas nekin û ji gemariyê nezivirin, ewê di nav wê gemariya xwe de rojekê bixeniqin.

Nîjadperesten ku xwedanê bîr û baw-eriyan fermî ne, her tim gelê kurd bi cud-axwaziyê tawanbar dîkin û dikujin û dişewitîn û gund û warênan wan wêran dîkin. Lê em ji wan re dibêjin dev ji behaney berdin, em dixwazin ne bi we tenê re bi her kesî cîhanê re, bi hezaran sal bêcudatî bijîn, lê bi mercen mirovahiyê, bi wekhevîtiya bêkemahî. Lewre tu kesekî kurd ji we tu kesî tirk û erib û ecem ne kêmtrî e. Hûn çawa dixwazin bi zimanê xwe bixwînîn, binivîsin û bi zimanê xwe bêne darizandin û bi waliyê xwe û hekîmê xwe û bi doktorê xwe re bi zimanê dayika xwe bi peyvîn û mijûl bibin, gelê kurd jî wekî we, van tiştan dixwaze. Lê hûn baş bizanibin bêkemayî, ew jî wekî we hemûyan mirov in, ne hirç û hov in.

Gerîla

li welatê me jiyan
bi xwe ye. Léxistina
dilê kurdan
bi gerîla dest pê kir.
Mêjî bi teqandina
guleyên gerîlayan re
xebitî û çavên gel
ronahiya rast bi wan re
dît. Ji bo vê yekê,
kî bi şev û bi roj
tiştên di dilê
gerîlayan de jîn bike
mîna gerîla, mîna wan
xebat û raman bike
ew li ku deverê be,
gerîla ye.



Zor û zehmetî, berf û baran, tazî û birçibûn, meşen li ber heyv û stêrkan, xewa rojê, serşûştina li çolê, xwarin û vexwarina çaya li ser kuçen agir, xwarina berf û vexwarina ava çeman û...

Ev gotin ji mirovên Kurdistanê re ne biyan in. Ew her dem gotinê wiha dibîzin, bi wan re dijîn, ji ber ku ev gotin jiyana nû bi gelê Kurdistanê dide nasin.

Gerîla, gerîlayen Kurdistanê li Cûdi, Gabar, Agirî, Engizek, Sîpan û li her deverê Kurdistanê di nava vê jiyanê de dijîn.

Gerîla çiqas li hemberî dijmin û kesiya dijmin şer dike, ew qas jî li dijî surîstê şer dike. Bi şerê gerîla hem mirovê kurd şîrin û xweşik dibe, hem jî dest û zozanê welat paqîj û bêhnxes

dibin.

Belê, her gaveke vê jiyanê zehmetî ye. Derketin û daketina li ser çiyayan, xweberdana devê şaxan, newalan, gera li ser qoç û qurman, çûn û hatina cengê, zanekirin û xurtkirina gelê kurd û parastina xweşikbûna deşt û zozanê Kurdistanê û hwd. ev hemû barê gerîlayan e. Ew di dadgeha serxwebûnê de neyar û xayînan didarizînin. Lewre riya jiyana gerîla, wekî riyên dadgehê dîrokî bi navê gel û mirovahiyê didin damezirandin.

Gerîla çandina ramanen nû ye di Mezrabotan de. Lî pêkanîna ramana Seroktiya ne barekî sivik e. Ji ber ku ji nû ve mirovahiya hemdem dide sazkin. Sazkirineke bi tîrêjîn ramanê Serokatiyê ye; ew ramanen Serokatiyê çavkaniya hêza gerîla ye li dijî neyarên mirovahiyê.

Gerîla bi çalakiyên xwe sosyalizma zanistî di tovîn kulîlik, rihan û bînevşan de dicine. Bi bayê paqîj, riya sosyalizma zanistî li hemû cîhanê vedike; vîna raman û baweriya mirovan mîna dara çinarê xurt û bilind dike. Belê gerîlayen Kurdistanê ne tenê gerîlayen Kurdistanê ne, gerîlayen hemû mirovahiyê ne. Ji ber vê yekê, hemû dewletên împarîyalîst û pêşverûyên cîhanê êris dîbin ser gerîla. Lî dîsa jî gerîlayen azadiyê deng û ramanen Serokatiyê li cîhanê belav dikin.

Dema gerîlayen Kurdistanê nebûna hêviya mirovahiyê, ne gengaz bû ku hêzen paşverû yekîtiya xwe ew qas xurt bikirana li dijî gerîlayen azadiyê.

Erê gerîla zehmetî ye, lî xwesî ye jî. Egîtbûn, mertbûn, paqîj û zelalbûn e. Girêdana gerîla bi gel û bi xweşikbûna rû bi rû zozanê Kurdistanê ve, dibe sedemâ tehêmûkirina hemû zor û zehmetiyen surîstê. Ji ber ku di ramana gerîla de ji zarokan re wê şahiyê çawa bînin, dayik wê çawa zar û zêcên xwe hembêz bikin û çawa tîrêjîn tavê yên şikesti wê rast bikin, heye.

Gerîla li ser çiyan ne bi tenê ne, mîna dijmin dibêje. Tevî ku di dilê gel de û bi gel re dijî, bi teyrê baz û qulingan re jî, dijî. Teyrê baz bi milyonan silavîn gel û pêşverûyên cîhanê dîbin ji gerîlayen azadiyê re.

Simbil, dema ku dijmin tune be helbesten serxwebûn û azadiyê ji gerîlayen re dixwîne. Yanê iro tiştên ku hemû mirov jê mehrûm in, gerîla pê re jîyan dîbin; bi pezkûvî û xezalan re, bi refen quling û qazan û bi şalûran re jîyan dike. Lewre gerîla bi êşan û zora xwezayê naêse. Çiqas zehmetî heye, ew qas jî şîrinbûn, ew qas jî paqîjbûn, zelaltiya kesaniya mirov û ew qas mîrxasî heye. Axaftina gerîla û bilbilan zora dijmin

dibe. Ji ber vê yekê dijmin, dar û beren Kurdistanê dişewitîne. Bi çekên kîm-yewî hemû sewalan difetisîne. Lî bilbil ji zû ve bi gerîla ve hatibû girêdan.

Bi gerîlayen re helbesten azadiyê dixwendin. Helbesten gerîla li welat, li Rojhilata Navîn û cîhanê diniqutînin. Mîna nuqitandina cotkarê genimê xwe di zivistanê de û çinîna wî di havîn de. Bilbil xeber danî ji gerîlayen re: Şewtandina gundan, qêrîna zarokan, lorîkîn dayikan, perîşanbûna kal û pîran, dil û cegerê gerîla bi kîn û nefretê dadi-girtin. Bi wan xeberan re gupegupa dilê gerîla hêj xurt û bilind dibe.


Jiyana gerîla her dem şer, xebat û pêşketin divê. Ji bo pêşketinan her dem çalakî û şer e. Berbanga sibê tîrêjîn tavê êdî pişkivîne bi ser Zagrosan de, şeqw û şemala xwe li welat dike.

Gerîla li welatê me jiyan bi xwe ye. Léxistina dilê kurdan bi gerîla dest pê kir. Mêjî bi teqandina guleyên gerîlayan re xebitî û çavên gel ronahiya rast bi wan re dît. Ji bo vê yekê, kî bi şev û bi roj tiştên di dilê gerîlayan de jîn bike mîna gerîla, mîna wan xebat û raman bike ew li ku deverê be gerîla ye. A gi-ring ew e ku mirov mîna gerîla bijî. Ev hêviya gerîla ye, ji her mirovekî welat-parêz re. Ji ber jiyana herî pîroz di welatê me de jiyana gerîla ye. Ji bo vê jî gerîla bang dike û dibêje.

Ez hêvi me dimeşim li ser çiyan
Der dikim hemû derd û kulan
Ez ronahî me, wekî tîrêjîn tavê
Şeqw didim her derê
Nebêjin mirin û tarî
Kar û xebat bikin mîna min
Hêvi bikin gîhaştina stêrkan
Serxwebûn û azadî wa ye ez im:
Gerîla...

AHMET HUSEYN





Adnan Işık

● 25.11.108

Di 25'ê sermawezâ sala 1908'an de li paytexta İmparatoriya Osmaniî Stenbolê rojnameyeke kurdî bi navê "Şark û Kurdistan" bi tîpên erebî, lê bi zimanê tirkî hate çapkirin. Rojname bi tenê ji çar rüpelan pêk dihat. Di bin logoya rojnameyê de nivîsa bi rengê: "Rojnameyek e ku rewşa siyasi ya Rojhilatê û xerabiyê Rojava yên li ser mirovahiyê teswîr dike." cih digirt.

Berpirsê Rojnamyê Ehmed Şerifî Hersekî Sernivîskar ji Bedriyê Meletiyê bû Tişte herf balkêş ew bû ku; nivîs û nûçeyen vê rojnameyê bi zêdeyî li ser Bosna-Hersekê derdiketin.

● 26.11.1994

Serokê. DEP'ê yê navçeya Tatwanê Şevket Epözdemir bi destê hêzên dewletê yê vêşarı li ser riya deşta Rehwayê hate qetilkirin.

● 27.11.1993

Belavkarê Rojnameya Özgür Gündemê Adnan Işık bi destê hevkareñ dewletê hate kuştin. (Özgür Gündem rojnameyeke kurdan a rojahe bû, li bajarê Stenbolê di navbera salê 1992-93'yan de hate weşandin. Komara tirk bi hemû hêzên xwe bi ser wê de çû û ew girt)

● 27.11.1978

Komîteya avakar a Partiya Karkerê Kurdistanê li gundê Fîsê a Licê, bîrîyara damezirandina partyê stand.

AWIR

Li Washingtonê Enstituya Kurdî ava bû

Li Washingtonê Enstituya kurdî hate avakirin, bingeha wê kurdêni ji Başûrê Mezin pêk tînin, berê jî xebata wan li ser navê KNC (Kongreya Neteweyî ya Kurdî) bû. Vebûna Enstituyê bi pîrozbahiyekê, roja 14'ê sermawezê pêk hat. Ji bo merasîma vekirina enstituyê nêzîkî 40 kes hatibûn. Di gel hinek kurd û dostê amerîkî û dostê tirkan Alan Megovsky ji besdarî vê pîrozbahiyê bû.

Li Washingtonê Enstituya Kurdî hate avakirin, bingeha wê enstituyê kurdêni ji Başûrê Mezin pêk tînin, berê jî xebata wan li ser navê KNC'yê (Kongreya Neteweyî ya Kurdî) bû. Vebûna Enstituya Washingtonê bi pîrozbahiyekê, roja 14'ê sermawezê pêk hat. Ji bo merasîma vekirina enstituyê nêzîkî 40 kes hatibûn.

Di gel hinek kurd û dostê amerîkî û dostê tirkan Alan Megovsky ji besdarî vê pîrozbahiyê bû. Her wekî serokatê KNC'yê, Serokê Enstituya Kurdî ji Dr. Necmedîn Kerîm e. Serokê Enstituyê Kerîm, bi axaftinekê xêrhatîniya mîvanan da û rîveberê enstituyê Mike Amitay bi mîvanan da nîsan. Dr. Necmedîn Kerîm wiha got :

Mîvanan ezîz û dostên hêja, ez gelekî spas dikim ji bo hatina we, armanca me jî ev e ku em bibin layiq ji bo dengê kurdi li Amerîkayê, deriyê me her tim vekiriye ji her kesî re."

Pîstî Kerîm, rîveberê enstituyê Mike Amitay ji axivî. Di axaftina xwe de Mike Amitay da zanîn ku ew bi xwe ne kurd e, bi eslî xwe cihû ye, lê hezkirina wî ji bo milete kurd gelek heye. Amitay, li ser têkiliyê kurd û tirkan mînakeke balkêş jî da. Got ku ew rastî xortekî ji Kazakistanî hatiye, wî-pirs kiriye ew li ku derê kar dike, dema Mike gotiye "Ez Dîrektorex Enstituya Kurdî me", yê Kazakistanî dibêje:

"Ez tirk im, lê hezkirina min ji

miletê kurd re gelekî heye û ez hez dîkim kurd bigihêne heqê xwe."

Mike Amitay piştî vê nimûneyê ji mîvanan re got: "Em hez dîkin rojekê kurd û tirk bêne ba hev, bi heqê însanetiyê biaxivin."


Di hundîrê Enstituya Kurdî de, li ser dîwaran resmî qetliama Helebçeyê, nexşeya Kurdistanê û çend pirtükên li ser dîroka Kurdistanê hebûn. Piraniya wan pirtükân li ser başûrê Kurdistanê bûn. Ji bo vekirina Enstituya Kurdî ya Washingtonê, Serokê Enstituya Kurdî ya Parisê Kendal Nezan ji hatibû.

Li ser doz û armanca enstituyê her wekî KNC'yê hinek şik û guman hene. Wekî m nak rîveberê Enstituyê Mike Amitay bi salan di Kongreya Amerîkayê i Komîsyona Helsînkiyê de kar i irîye, bi tenê ji bo pereyan dîxel ite. Tê gotin ku wê cihê KNC'ya ku di sala 1988'an de ava bû, îcar wê enstitu bigire.

Her wiha tê texmînkerin ku wê Enstituya Washingtonê li ser navê Enstituya Parisê karê lobîtiyê bi ke. Yanê wê enstituya kurdî dîst biavêye warê AKIN'ê, di xebatîn diplomatîk ên kurdî de duserîtiyê çêbike. Gelek amerîkî kurd rexne dîkin, ji ber ku ew di bin banê saziyekê de nayê cem û ji hev cu da dixebeitin.

SERDAR TAJAN/
WASHINGTON

ÇAVDÊRÎ



MİRHEM YİĞİT

Nabî, Ehmedê Xanî û Apê Mûsa

i gîra ansiklopedî û antolojiyê tirkan, şairê kurd Nabî di sala 1642'yan de li bajarê Ruhayê hatiye dînyayê. Navê wî yê eslî Üsîf e û ew kurê Malbata Gaffarzade ye. Ev malbat alîm in. Li gorî serçavîyen bi tirkî, Nabî-xwendinekê mukêmel û bêqûsûr kiriye û hin dîbêjin di temenê 23 û hin jî dîbêjin di 24-25' an de çöye Stenbolê. Li Stenbolê li ba Muhasib Mustefa Paşa maye; ewil mîna katîbê diwanê û bi dû re wekî ketxudayê wî. Dîsala 1671'ê de Osmaniî diayejin ser Lehistanê û di nav artêşâ Osmaniyan de Nabî jî heye. Wê salê Nabî berhemeye bi navê "Fethîname-î Kemanîca" dinivîsine û pêşkêşî Sultan dike. Sultan wê diecibîne. Di vê navê re-li dora 11 salan derbas dibe. Nabî berhemeye duymîn amade dike. Navê wê "Tuhfet-ul Haremey" e. Vê carê ne bi tenê sultan berhemeye wî diecibîne, belê xelatekê jî didê. Xelat kurkekî ji eyarê qûzikan e. Serdema ku Nabî li heyatê ye serdemeye bêistîqrar e, sultanek diçe û yet tê û pâşa û bîrêveber jî wiha. Tê gotin ku Nabî desthilatiya şes sultana dîtiye. Li aliye ev rewşa giştî û li aliye din kurdîbûna Nabî û deqarûtî û duristiya wî, dibin sebeb ku piştî mirina Mistefa Paşa û hatina Çorlu Alî Paşa rewşa wî xerab bibe; ew dev ji Stenbolê berdide û di nav psîkolojiyeye mîna ku bêje "heta me xwe nas kir me emir xelas kir" vedigere Kurdistanê. Demekê di navbera Stenbol Heleb û Ruhayê de diçe û tê û pişt re di temenekî 70 salî, di sala 1712'yan de serê xwe datîne, diçe ser heciya xwe.

Tiştîn ku Nabî nîvîsandine ne kêm in. Ew li gorî zeman û şertîn xwe, nîvîkarekî berhemdar û biber e. Du dîwanen wî; yek bi farîş, yek bi tirkî hejne. Jê û pê de hejmarek mesnewî nîvîsiye weki: Hayriye, Hayr-i Abad, Surname, Munseet (nameyên Nabî ne), Fethname-î Kemanîce (behsa sefera Lehistanê dike), Tuhlef-ul-Heremeyn û hwd. Ji bo nîvîkarî û helbestvâniya Nabî ji serçavîyen tirk (Divan Şîri Antolojisi rûp: 552-553 û Yeni Hayat Ansiklopedisi rûp: 2446) vê dîbêjin: Nabî bi uslûba xwe di edebiyata tirkî de deriyekî û vekiriye. Di helbesten wî de berî his û xeyalan, fikir, bandîr û degel e. Ew li ser kêmânî, nerêkûpêkî, sextekârî û xerabiyê zimanê xwe bi xurî û bi cesaret rawestiyaye û bi zimanekî sade, rehwan û bedew nîvîsiye. Nabî realist e û rexnegirekî di ser xwe re ye. Ji bo wî helbest, ne quretiyên vala û lîstika bi peyvan, belê rî û awayekî ronidarkirinê ye. Hewaya helbesten wî xweser û têra xwe orjinal e. Helbesten wî jî dil dixuyîh, baweriya mirov bi wan tê û rîpêşander in.

Ehmedê Xanî neh salan ji Nabî bicûktir e, hemdemê wî hesab dibe. Bi îhtîmalke mezîn ew ji Nabî, jiyan û serpêhiya wî bixeber e. Û her wiha ked û xwêdana wî ya ku ew qas sal ji sultan û paşayen Osmaniyan re kir ku tiştekî xelet û ne rast bû, wî jî zane. Ne dûr e ku sebekî jî ev be çîma xwe daye Mem û Zîn. Çîma xwe dûrî meqam û dîwanen-deshilatdarên tirk, faris û erib girtiye. Mirov dibêje qey Ehmedê Xanî ji qırıktelî û kezabreşîya Nabî li gorî xwe hin ders û netice derxistîne, newwestîye mîna Nabî silûka xwe bişikîne û bi giş taqeta xwe hewl daye ku ji bo kurdan û alîmîn wîlât xwe hin tişîn bibêje.

Zana û rewşenbîrekî din ku ne biştîmalke, belê bi qutbirî û teqeziyeye temam çîroka Nabi nas dike û mirov dikare ji nîvîsandîn wî bixwîne û ji gohîn wî yêni di sohbet û meclisan de guhdar bûbe Apê Mûsa ye. Ev beyta Nabî mîn bi xwe çend caran salan nav: 1980 û 1984'yan ji dîvî Apê Mûsa bihistîye: Bir nehri muazâm gibi tuş elmişem / Heyhat kurak collarden akip geçmişem."

Yanê ci-mixabin: kû ez mîna aveke mezîn di nav kerembej û çolîstanê re diherikim, lê xema kî yet! Kesî jî nû bikêrîfti ku ji mirî istifade bike, tiştekî li ber mîn biçîne ne xuya ye. Di vê beyta Nabî de gazin hene, Dilekî bi xwe dişewite û liberkefinê heye. Mirov, pejna kurpekurpa dilekî guvaşî, bi derd û keser dike. Gazin ji rewşa gelê kurdîn. Ji desthilatdar û xwedîgotinê kurd in. Ji bêçaretiyê ne. Ji wê ye ku çu qedir û buhayekî şair û alîmîn kurdan tûne. Zahebûn û pêzânîna wan bi erde de diçe, jiyanâ wan vala û bêmîbesit e. Serê ku behîfta wan li ser e, ne diyar e. Ne xwedi çu ewleyî û wêbêyeke dilxwesîkîn. Her tiş dikare bê serê wan. Dikarî, bîkevin ber her şek û pekî û ji bo wan çu demanek, star û taldejî, paşmîr û piştqewîniyek tune ye. Ev gazin û axîna ji kûraya kezabê ku derdekî hevbeş e ji bo zînenda û alînên kurd ku mirov dikare li ba Hecî Qadirê Koyî û heta Evdilleh Pêşew ji bibîne, berî Xanî heye heta Nabî dirîj dibe. Di Mem û Zîn a Ehmedê Xanî de ji beytên di rengê ya Nabî de û bi eynî psîkî / tîfîkare hatine gotin zehf in, weki:

Gelo qet mimkûn e ku çerxa felekî ji bo me jî / Stêrek derkeve û bi wî awayî bextê me vejî/ Bextê me ji me re bibe yar / carek ji xewê bibe hisyar/ Ji me re ji rabe kesekî ku dînya xwe bispêre û pê bîne bahwî / Peyda bibe ji me re ji mîrek / û ji me re bikî mîri / Û şûrê hunera me bê danîn/ Qedrê qelema me ji bê zanîn/ Derdê mc bibîne derman û dewa/ Zanîna me ji bibîne rûmet û rewa/ Eger hebûya ji me re ji mîrek / serfiraz/ Qencîkar, ji peyvîn xwe re piştgir û dilxwaz/ Diravê me dê bi sîkkeye bihata çapkirin, bi wî awayî/ Dê nema weha berguman û nereweyî."

(Mem û Zîn, E. Xanî, Wergera M.E. Bozarslan, Rûp: 171)

'Hunereke qels jî dikare di dilê gel de cih bigire'

**Parçebûna welêt çawa
kiriye ku em ji her aliyî ve
ji hev qutkirî û bêhay bin,
wisa kiriye ku hunermendên
me jî ji hev bêagah û
qetandî bin.**


**Her kes di parçeyê din de
maye. Hê nû em bi hev
dihesin, em deng li hev
dikin, xwe digihînin hev.**

**Berê hem rê girtî bûn
û hem jî alaveke
(wesiteyek) ku bi riya wê
em xwe ifade bikin nebûn.
Lê niha em xwedî van
îmkanan in, çendî ne bes bin
jî. Nûnerê me yê Sûriyeyê
HELÎM YÜSIV bi vê
hevpeyvînê dengê
hunermend Mihemed
Elî Şakir radigihîne me.**

Mihemed Elî Şakir yek ji van hunermendan e ku weşartî û bêdeng kar û xebata xwe ya muzîki berdewam dike û sazbendekî xurt û hestenik e. Gelek ji stranên wî di dil û mêjiyê me de cih girtine, bêyî ku em zanibin ev stranên nemir ji saz, awaz û gotinên wî ne. Çimkî bi dengê birayê wî yê bi nav û deng Mehmûd Ezîz, an jî bi dengê Mihemed Şêxo hatine stirîn.

Hejmara stranên wî gîhîstine sed û pêncî, tevde bi dengê Mehmûd Ezîz belav bûne. Niha destnîsek bi sermîvîsa "Şest awaz û sazbendek" amade kiriye û li hêviya çapê ye. Di vê destnîsê de şest stranên wî hatine nivîsandin, bîst ji wan "note" kirine. Ew stranên herî navdar in. Û cil stranên din, helbest tenê danîne. Ev hunermendê ku bi sedan avahî di dilan de ava kirine, mi-xabin hinekî bi derengî me ew nas kir ku endezyarê muzîka kurdî ew bi xwe ye. Em bi hêvi ne, ji îro pê de ev hunermend hinekî ji mafê xwe bistîne û li ser jiyan û têkiliyên wî yê kevn bi muzîka kurdî re bê rawestandin.

Di navbera hunermend û hunerê de
gelek girêdanên veşartî hene, xuyayî û
nexuyayî, hûn dikarin hinekî li ser



*destpêka van pêwendîyan bi awayekî
dirêj rawestin?*

● Di xwendinê de pêş min dest bi tecwîda Quranê kir. Mamoste gelekî ji dengê min hez dikir, pişt re mirovekî bilür anî ez ho bûm (hîn bûm) bilürê, lê min dît ku bilür nikare meqamên muzîkê tev de bigire. Hetanî sala 1963'an

Hesenê Cizîrî, Meryem Xan, Eysê Şan û ji îstgeha kurdî ji Îranê, Mecîdê Herkî, Behadîn Dostikî û ji stranên soran Şemal Saib, Cemal Celal, Fûad Ehmed.. Van gelekî bandora xwe li ser min hiştin ligel bandora hinek hunermendên erek mîna Mihemed Ebulwehab, Ferîd Eletres û Feyrûz.

wî M.E. Şakir e, hûn çawa ji hev cihê bûn?

● Di destpêkê de em her du dengbêj bûn, lê dema ez çûm leşkeriyê, karê min rawestiya û bi dû re jî karê mamosetiyyê û dijwariyên jiyana rojane. Çimkî ez bi temenê xwe ji Mehmûd mezinir im, ev sedem tevde, digel ku min Mehmûd serbest kir û bêhtir min xwest ku ev dengê zelal winda nebe, Mehmûd ma ji dengbêjiyê re û karê min bû çekiîrina awaz û saz û helbesten stran.

Ê zêde hişt ez helbestê binivîsinim ew bû ku, helbestvanen strana kurdî tu-ne bûn. Min xwe bêhtir sazbend didît. Ji bili min, Bêbuhar (Yûsif Berazî) çend helbesten ku bûn stran nivîsandin, wekî "Hebs û zindan", "Were were gu-lizare", "Te dilê min bir lê canê", "Şînbû rîhan", "Felek heyîl".

Mehmûd çû ev stran di îstgeha kurdî de di salên 1969 – 1970'î de tomar kirin. Pişti Bêbuhar rawestiya û saz ne-ma dan, min dest pê kir û min ev stran dan:

Zeynebê, Ay lê gulê gulşînê, Hela bine, Leylanê, Ez keçika kurdî me (ya ku Gulistanê jî stira). Helbest bi alîkariya Bêbuhar hatin rastkirin û zencîra stran hetanî sed û pêncî û zêdetir di-rej bû: Carekê mi j' xwer dî gewrek,

Carinan bi hunereke qels, dengbêj dikare cihîki mezin di dilê xelkê de bigire. Ev tişt li ser Şîvan ji rast e. Dema rê ji rexneyan re vebe wê gelek hunermend li bêjingê bikevin. Mihemed Şêxo teqlîda Tehsin Taha û Seîd Yûsif û Mehmûd Ezîz dikir. Û Şîvan ji hew bi dengê xwe derket, dikarîbû û zanîbû bêhtir eşâ milet bi hostayî bigota.

min ûd peyde kir tu kesî nizanîbû dû-zan bike, min û Mehmûd (birayê wî yê dengbêj û navdar) bi hev re dest bi lêxistina ûdê kir.

Ligel ku biçûkanî, tê bîra min, rad-yoyek kevn li taxa me hebû, wê çaxê radyo tune bûn, her êvara ïnê weşanên îstgeha (îstasyona radyoyê) kurdî li Bexdayê hebûn. Ligel îstgeha kurdî li Tehranê, min bi dawa diya xwe digit û ez diçûm ber stranên kurdî di radyoyê de. Stranên Mihemed Arif Cezaîwi,

Ew radyo dibistana min a yekemîn bû. Pişt re em hatin kemencê, hêdî hêdî em fêr bûn, lêxistina kemanê, bê akademî û bê mamoste, wê çaxê min distira, lê dixist, pişt re hêdî hêdî Mehmûd bû dengbêj û stranên me belav bûn, bê alîkariya tu kesî me xwe ava kir.

Xelkê me tev Mehmûd Ezîz ê dengbêj nas dike û li ber dengê wî kîf û ga-hî û gîriyê xwe jî kiriye û dike, lê kêm kes dizane ku gopalê vî dengî, birayê

Gava li me hat, Eyd û erfat, Ber dile min pir gérin e û hwd. tevde Mehmûd Ezîz stiran.

Wê demê, di rewşa kurdan de -li vir-qonaxeke nû vebû, qedexekirina ziman, muzik û stran, her tiştî xwe bi rengeki dîtir pêşkêş dikir. Di nav pêlén vê reşayî û zorê de we çawa ev karê pîroz berdewam dikir?

● Pişti 1969-70'yi, Mehmûd ji Bexdayê vegeviya, çimkî her tiştî kurdî qedexe bû, me berê xwe da Beyrûdê û bi serokatiya Mehmûd Ezîz digel Mihemed Şêxo û Remedan Nicim Omerî "Koma Serkeftin" hate damezrandin. Çend hunermendênermen ji endamê vê komê bûn, me di gel dengbêjekê, bi navê Perwîn, şevêne muzika kurdi di newrozan de li dar dixistin. Hetanî sala 1974'an her kes vegeviya mala xwe.

Di wê demê de koma Newroz a hunermend Seid Yûsif ji hebû, Mihemed Şêxo ji koma Newroz hat, bû endamê "Serkeftin"ê û berdewam kir heta kom gîhişt roja dawî. Gelekî karê komê deng da û zêdeyî carekê di istgeha Lubnanê ya erebî de dengê me derdiket.

Her du koman (Newroz û Serkeftin) xebateke mezin bi hev re kir û di sala 1973'yan de li Sînemaya Salomî şeveke bi dengê Mehmûd Ezîz û Seid Yûsif û Şêrin Melle li dar ket. Û li Urduñê (li Emmanê) şevez din (di jûbileya zêrinî ya Melek Husen de) Mehmûd û Şêrin stranê kurdî gotin, min ji hem berpirsiya koma muzikê dikir û hem ji min li kemanê dixist. Hejmara me heft bû, digel endamêne gotendê. Bi vî awayî karê me dimeşıya, li derveyî welêt hetanî ku bûyeren 1974'an bi ser Lubnanê de hatin û rî, ji bilî şer, li ber her tiştî hate girtin.

Em vegeviyan karê xwe yê berê. Ez bûm mamoste û min saz û helbest duristin û bi dehan min stran ji Mehmûd Ezîz re pêşkêş dikirin, bibore, min ji gelê xwe re êşen xwe dikirin şahî û stran.

Ji bilî stranê ku we dan Mehmûd Ezîz, we bi xwe ci kir, we ci stira û tomar kir, hûn çawa fêri note-nivîsanda muzikê bûn?

● Min di 1993 û 1995'an de, du kaset tomara kirin. Digel M. Ezîz û Mistefa Xalid û Husen Şakir. Di kasetta pêş de yek ji helbesten Tîrêj tê de cih girtîye û di ya 1995'an de, du helbesten (Dildarê Şeko û Cegerxwîn) hene û helbesteke Cizîrî, awaz tevde yên min in. Ji bilî çend stranê folklorî ne min û ne Mehmûd, me ji tu kesî re nestiraye.

Ez dibêjim gotina ku ereb bi kar tînin "mûsîqar" ji du beşan hatiye amadekirin. Muzik peyveke yewnanî ye û kar peyveke kurdî ye. Ji dibistanê min pirtükîn li ser muzikê dianîn. Min dixwendin û min zanibû ku muzikvan bêyi note nabe. Bi kar û keda xwe ez ho (hîn) bûm gelek tiştîn li ser muzikê. Di destpêkê de min wisa dest bi damezrandina sazan kir, bênote. Hêviya min



bû ku ez di akademiyeke muzikê de bixwînim. Lî ev hêvi bi cih nehat. Ji 1980'î ve ez note dinivîsinim û bi alîkariya heval Şêrzad Umed -çimkî wî akademiya muzikê xwendiyê û kuta kiriye - min ev berhevok amade kiriye ji çapê re.

Em dixwazin hinekî têkiliyên we û helbestê, têkiliyên helbest û awazan, bidin ber roniyê; gotin û saz çawa dîbin canek, dîbin gewde ji stranê re?

● Dema min xwest ez hinekî vê wâlahiyê dagirim û riyeke ji nivîsandina helbesten stranê re vekim, min dest avêt dîwanen helbesta kurdî û min dest bi xwendina van kir:

Xanî, Cizîrî, Cegerxwîn, Tîrêj, Osman Sebrî, Sebrî Botanî, Bêbuhar û hwd. Digel kovar û rojnameyan û dî-

meta stranê.

Di dil û hesten gel de - li gor dîtina min - Mihemed Şêxo, berî M. Ezîz û berî S. Yûsif cih digire û hetanî iro guhdar û hezkeren deng û stranen wî pir in, lê di axastinê we de, hûn dixwazin hinekî vê rastiyê ji bîr bikin, cîma?

● Ji ber ku kurd dilovan in, hestgerm in û Mihemed Şêxo bêhtir dikaribû ya dîlê wan bigota, bi dengê xwe yî germ û xemgîn, pê ve dihatin girêdan û zor û tehdeyî bêhtir lê hat. Nemaze di bin desten istixbaratan de. Çû Kurdistanê (Başûr) û ji wir cû İranê û dijwariya jiyana wî ew bêhtir nêzîkî dîlê mîlet kir. Lî di warê hunerê de Seid Yûsif û Mehmûd Ezîz li pêş wî bûn.

Carinan bi hunereke qels dengbêj di-kare cihekî mezin di dîlê xelkê de bigi-

Niha hûn karê xwe çawa berdewam dîkin, ci projeyen we hene, ci raman ezmanê van rojêne dixemilînin?

● Di destpêkê de dîsa li ser stranê iro, ez dixwazim hinekî rawestim. M. Ezîz bi dengê xwe yî xurt mafê stranê min didanê û M. Şêxo ji çend stran gotin, lê niha Mistefa Xalid (28 sal) û Husen Şakir (28 sal) hene ku du dengên girîng û şîrîn û nûne. Teví ku Şêrin du stranê min gotin (Ez Mem im û Ey delalo) û Gulistanê (Ez keçika kurdî me) û ji Şehîrbana Kurdî re ji me kasetek helbest û awaz amade kirine. Û ji sala 1983'an ve me Koma Buhar damezrandiye û heta niha ez û Mehmûd û heşt muzikvanen li ser ûd û tembûr û org û dahol û çar li ser kemanê. Bi vî rengî karê me berdewam e. Lî hêviyeke min hebû ku ez xwendineke muzikî bixwînim û roleke mezintir di muzika kurdî de bilîzim. Çimkî hezkirina Serhed, Amed, Zozan, Ferat, Dijlê... tim di dîlê min de brûsk vedida û gul ji tim sembo-la me bû.

Rojekê ji rojan agirê kurdayetiyê di hundirê min de venemirîye, hêviya din propagandaya kurdî, min dixwest televîzyon û istgehêne kurdî pirtir û bi nirkir bûna, me ji dikaribû muzika kurdî zengîntir û çêtir bikira.

Gotina dawî?

● Spasî û silavêne taybeti ji Azadiya Welat re û hêviya berdewamkirin û gîhiştina armancen xwe ji me û wan re dixwazim. Berî mirinekê min dixwest Kurdistana Bakur saz bibe û televîzyona kurdî ji Amedê weşanen xwe pêşkêş bike. Hêviya min ew e ku weki Bedirxaniyan li ber xwe bidin bêtirs û bi lehengî û serbilindi karê xwe bi pêş de bibin.

Jber ku kurd dilovan in, hestgerm in û Mihemed Şêxo bêhtir dikaribû ya dîlê wan bigota, bi dengê xwe yî germ û xemgîn, pê ve dihatin girêdan û zor û tehdeyî bêhtir lê hat. M. Şêxo cû Başûr û ji wir cû İranê û dijwariya jiyana wî ew bêhtir nêzîkî dîlê mîlet kir. Lî di warê hunerê de Seid Yûsif û Mehmûd Ezîz li pêş wî bûn.

wanen helbesta nûjen û pirtükîn Deham Evdileftah ji bo ku ramanen kurdî li cem min xurt bibin. Lî dîsa min ji bilî helbesten stran, tu helbest nenivîsandine.

Pêşî muzik, saz û awaz di hişê min de cih digire, pişti re ez gotinan li gorî wê pêk tînim. Ji ber vê rîzbendêne helbestan şikestî tîn. Helbesten min ne serbest in û ne ji rîzbenda wan weki hev e. Li cem min helbest dikeve xiz-

re. Ev tiştî li ser Şivan ji rast e. Dema re ji rexneyan re vebe wê gelek huner-mend li bêjingê bikevin, Mihemed Şêxo teqlîda Tehsin, Taha û Seid Yûsif û Mehmûd Ezîz dikir. Û Şivan ji hew bi dengê xwe derket, dikaribû û zanibû bêhtir êşa mîlet bi hostayî bigota, lî ev tim nayê wê wateyê ku xwendiyê vî dermanî hunereke girîng û temen dirêj pêşkêş dike.

Ji amûrên muzîkê yên jîdar:

Çeng

Amûra çengê, iro ne li cem kurdan bi tenê, li nav gelên derdorê me jî ew qas bi berfirehî nayê bikaranîn. Belê li Ewrûpayê buhayekî giran dane vê amûrê û hinek kilîl jî lê zêde kirine, her wisa navê çenga kurdi, bûye 'harp'.

Berî destpêkirina vê nivîsê, min divêt bidim xuyakirin ku wekî her car, jêderk û çavkaniyê min dîsa pirtûka lêkoliner hêja "Amêrekanî Mûsiqay Kurdi" ya masta Urya Ehmed e.

Pêkhatina amûra çengê

Çeng, amûreke jîdar e û şûnwarê vê amûrê ji' heyamên kevn de Rojhilata Nêzîk, ango derdorê Zagrosan tê zanîn.

Ev amûra ku mîna çengê mirovan e, ji sê parçeyêne sereke pêk tê. Ji parçeyê binî yê çengê re 'binik' tê gotin. Ev binik, her wisa sindoqa deng e jî. Ji parçeyê serî re jî 'mil' tê gotin. Parçeyê sêyemîn jî, jiyêن (têlên) amûrê pêk tînin. Parçeyekî dîtirî vê amûrê heye ku ew jî mîna enîcka milêni mirovan e, jê re 'kilore' tê gotin.

Jenandina vê amûrê yan bi kefa dest e, yan jî bi serê tilîkan, bi girtina têlan e.

Mêjûya amûrê

Profesorê Elmanî W. Stauder, ê ku bi lêgerîn û lêkolîna xwe ya li ser ziman û mêjûya muzîka cîhanî hatîye na-sîn, di sala 1957'an de yekemîn pirtûka xwe bi navê 'Çeng û Kînareya Sûmerî' û duwemîn pirtûka xwe jî di sala 1961'an de, bi navê 'Amûrê Çeng û Kînareya Rojhilata Dûr, li Serdema Babîliyan û Asûriyan' çap kiriye, wisa dibêje:

"Amûrên ûd (kod), çeng, kînare û gelek amûrê dîtirî kevn ên Rojhilat jî, yekemîn car ji layê çiyayîyan ve hatîne duristkirin, an jî wan (wek Kaşî, Hisî û Xuriyan, bi taybetî jî Xuriyan) ligel xwe anîne Iraqa kevn. Ji ber ku berî zayînê di sedsalâ panzdehan de, desthilatdariya hemû navçeyêni li navbera go-la Wanê û bakurê Iraqê di destê wan de bû."

Dr. Subhî Enwer Reşîd jî, di pirtûka xwe ya bi navê "El alat el müsîqiye fi el'usur el islamiye" (Amûrê muzîkê yên li serdema islamê), rûpel 126, de dibêje:


"Di hemû kitêbên kevn û nû de yên ku bi zimanê erebî hatîne nivîsîn û weşandin, jî bo vê amûrê (çengê) dibêjin ku yekemîn car farisan òi kar aniye.

Ez jî dipirsim û dibêjim; çîma, ev peyva 'çeng' wê bi farisi be, yan jî, di bingeha xwe de wê ne bi kurdi be?! Ji ber vê çendê, ez vî maflî bi xwe re dibînim ku ez vê pirsê bikim.

Çimkî, di gelek helbesten helbestvanen kurd de û di jiyana rojane ya gelê kurd de peyva 'çeng' bi berfirehî tê bikaranîn. Bo nimûne: *Çeng dane cil çeng saz semturan* (Xanay Qubadî, Şîrîn û Xusrew, rûpel 724)

Zû derînin ji çengê dijmîn û destê sîtem. (Hêmîn Mukriyânî, Ta-rîk û Ron rûpel 61)

Di jiyana rojane ya gel de jî bi peyva 'çeng' e



tê kar kirin, dibêjin: Çenga min tijî kir. Min çenget lê da û her wisa...

İca bo ci ev peyv wê ne bi kurdi be?!"

Tûma Biwa jî, di pirtûka xwe ya bi navê 'Jiyana Kurdevarî' de dibêje:

"Di dema împaratoriya Sasaniyan de, gelê kurd xwedî amûrê muzîkê yên pir pêşkeftî bûne."

Li gorî daxuyakirina Mamosta Ur-ya, li nêzîkî bajêrê Kirmâsan (Kerman-şâhî) jî, di nav kavîlê Taqûstana Çiya-yê Bêsitûn de kavalberekt (tabletek) kevnar hatîye dîtin, ku tê de wêneyê mirovekî de belemê (keleke) de rûniştiye û çengê dijene, heye. Amûra çengê, iro ne li cem kurdan bi tenê, li nav gelên li derdorê me jî ew qas bi berfirehî nayê bikaranîn. Pêgotiveke kurdî heye, dibêjin nokên me çûn bajêr bûn leblebi. Belê li Ewrûpayê buhayekî giran dane vê amûrê û hinek kilîl jî lê zêde kirine, her wisa navê çenga kurdi, bûye 'harp'.

Hêjayî gotinê ye ku navê amûrê çengê jî, wek amûrê dîtirî kurdevarî û di-gel navê wan amûran di metelok, hel-

best û pêgotiyênd kurdî de xweş derbas dibe. Ez dixwazim bi çend mînakên ku navê amûra çengê tê de derbas dibin, bi çend rêzen ji helbestvanen kurd nivîsi-na xwe bi dawî bînim.

Ce soz sazan seday def û çeng

(Xanay Qubadî, Şîrîn û Xusrew)

Nexmey saz û çeng, çengî xoş aheng
(X.Q.Şîrîn û Xusrew)

Çeng û def û súrna û naqûr...

(Gelêri)

Peyapey lêde çeng û ney,
demadem bê ne peymane

(Wefayî)

Serim Sentûr û sînem çeng û dil def ...
(Gelêri)

Bê ûrte dilim binalé wek çeng

(E.Xanî)

Bidengê berbüt û çeng
û xerîkî badenîşin e

(E.Muxtar)


Newaya mitrib û çengê

Fixan avêjte xerçengê

Were saqî heta kengê

Neşoyin dil ji vê jengê

(M.Cizîrî)



Li navendê çandê çalakiyên vê hefteyê:
Li NCM'ya Stenbolê

- 24.11.96: Resital: Çetin Akdeniz û mîvanen wî, saet: 15.00, Dîlan: Koma Serhîdan, saet: 18.00
- 27.11.96: Semîner: Li ser suryaniyan. Y. Bilge, saet: 18.00
- 29.11.96: Konsera Grup Kızırmak, saet: 18.00
- 30.11.96: Film: Diwar (Duvar), Gerînende: Yılmaz Güney, saet: 13.00, Teatra Jiyana Nû: Daweya Generalê Teneke, saet: 17.00

Li Evrensel Kültür Merkezi:

- 24.11.96: Film: Dilê Wêrek (Cesur Yürek), saet: 15.00 û 19.00

- 25.11.96: Film: Kafka, Gerînende: Stewen Soderberg, saet: 15.00 û 19.00
- 26.11.96: Film: Kostumvan (Köstümçü), Gerînende: Peter Yates, saet: 15.00, Xoşewîsta min Funci (Sevgilim Funci), saet: 19.00
- 27.11.96: Film: Duşema Sor (Kırmızı Pazartesi), saet: 15.00
- 28.11.96: Film: Rojbaş Babil (Günaydin Babil), Gerînende: V.P.Taviani, saet: 15.00 û 18.00
- 29.11.96: Film: Salê Mor, Gerînende: Stewen Spielberg, saet: 15.00, Şano: Ceribandina Teatra Hovîlîyê, saet: 19.00
- 30.11.96: Şano: Xoxek û hezar xox, saet: 11.00, Panel: Madeyên Narkotik û Cesareta afirandinê, saet: 15.00
Film: Roja Dansê ya Dinyayê, Gerînende: Mario Novaro, saet: 19.00

RÜDAN

Şahiya bîranîna Melayê Cizîrî

**"Daxwaza me ew e ku
rewşenbîr di vî warî de
piştgiriye bidine me. Bi vê
mebestê me şeveke bi vî rengî
li dar xist da ku em sala
1997'an bikin sala
Melayê Czîrî"**

Enstituya Kurdî ya Stenbolê roja 12'ê sermawezê şevez ji bo bîranîna Melayê Cizîrî li dar xist. Nêzîkî hezar kesî beşdarî vê şevê bûn, kesen wekî A. Melik Fırat, Mehmet Metiner, rayedarêن HADEP'ê û hin kurdêñ li derveyî welat jî mîvanen şeva bîranîna Melayê Cizîrî bûn. Di şevê de valahiya herî mezîn ku xwe dida xuyakîn jî cihê avakarê Enstituyê Apê Mûsa û İsmail Beşikçi bû. Lî serokê Enstituyê yê yekemîn Musa Anter jî bi durişmîn wekî "şehîd namirin" hate bibîranîn.

Şevê bi axaftina Serokê Enstituyê Şefik Beyaz dest pê kir. Şefik Beyaz di axaftina xwe de bal kişande ser edebiyata kurdî û saziyên çand û hunerî. Beyaz wiha axivî: "Fro pir saziyên kurdan ên siyasi hene û di warê xwe de serkeftî ne. Lî saziyên çandî û hunerî hê negîştine wê merhaleyê, divê berî .ku em saziya xwe bigîhîn wê merhalyê em edebiyata xwe, bingeha xwe, çanda xwe baş bizanibin, ev jî karê saziyên çandî û hunerî ne. Daxwaza me ew e ku rewşenbîr di vî warî de piştgiriye bidine me. Bi vê mebestê me şeveke bi vî rengî li dar xist da ku em sala 1997'an bikin sala Melayê Cizîrî. Şîrîn Melayê Czîrî xwedî wateyên pir girîng in, em dixwazîn ne jî bo kurdan, ji bo hemû gelên Rojhîlata Navîn û bi cîhanê bîdîne nasîn, bi vê mebestê girîngîya edebiyata kurdî li cîhanê belav bikin." Pişti axaftina Şefik Beyaz, koma muzîkê Grup Munzur derkete seheyê, çend stranêñ kirdî û tirkî gotin.

Pişt re mîvanen şevê A. Melik Fırat derkete sehneyê ji bo axaftinê. Fırat wiha dest bi axaftina xwe kir: "Guhdarîn hêja, gelê mazlûm, gelê bindest. Em iro li welatê xwe bi cîranê xwe re di bin zilmê de dijin. Ji ber vê yekê jî em tîne kuştin. Em zimanê xwe niza-



Şefik Beyaz

nin, çanda xwe nas nakin, kêm kes ji ziman fêm dikin. Ziman neynika gelan e, gel bi zimanê xwe, bi çanda xwe, bi kultura xwe têne naskîrin. Daxwaza me ev e em zimanê xwe, çanda xwe, edebiyata xwe, bizanibin, nas bikin. Lî em tîn kuştin, her ku têne kuştin ji nû ve şîn dibin, dibine tov ji axê dîrdîkevin." A. Melik Fırat bal kişande ser gi-rîngîya edebiyata kurdî û wêjevaniya Melayê Cizîrî jî. Bi helbesteke Melayê Cizîrî axaftina xwe ya bi kurdî qedand. Pişt re axaftinek jî bi tirkî kir. Di axaftina xwe ye tirkî de jî wiha got: "Çawa ku avahiyek dema ku wê were çêkirin, mîmar, mihendis û xebatkar kedê didinî, iro edebiyata kurdî jî kesen wekî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Cegerxwîn afirandine. Ev hîmî edebiyata kurdî ne, divê em wan baş nas bikin ku edebiyata xwe, çanda xwe, zimanê xwe jî nas bikin..."


Şev bi kurte konsereke Metin Kahraman domiya. Pişt re ji endamîn Enstituyê Feqî Huseyin Sağınç axaftinek kir. Her wiha di şevê de malbateke kurd ji Tiflîsa Gurcistanê hatibû. Keçeye wan a 7 salî Meryem, derkete ser sehneyê û çend stranêñ kurdî stirin.

Mîvanen şevê Dildar Şeko çend helbesten Melayê Cizîrî xwendin, pişt re ji Nurettin Karacadağ, ji helbesten xwe yên ku ji bo Melayê Cizîrî nîvîsandibûn, xwend.

M. AGIRÎ

TÎSK

ŞÜKRÜ GÜLMÜŞ



Jin û jiyan

D i tarîxa 11'ê mijdarê 1996'an de ez beşdarî programa zindî ya Med-TV'ye bûm. Mijar li ser wan çalakiyên "întîxarî" bû. Beşdariya min a yekemîn bû. Ezê cara yekemîn bi kurdî biaxivîma. Piraniya kesen ku beşdarî programê bûbûn kurd bûn. Lî mixabin bi kurdî nîzanibûn. Sê mîvanen me yên biyanî hebûn. Yek ji Îngîlistanê, yek ji ïrlandayê û yê din jî alman bû. Wan bi kurdî nîzanibû. Mirov karibû li van mîvanen delal biboriya. Em bi kîfxweşî borîn. Lî, yên ku kurd bûn û bi kurdî nezanîbûn, dilê min eşandin. Ez di şûna wan de jî li ber xwe ketim. Cegerxwîn hate bîra min. Mamosteyê mezin wisa digot: "Min digot qey tu bi zimanî! Lî bi kurmancî nîzanî" Çiqas rast e û durist gotiye. Ji bona vê yekê ez û hevalê xwe Selim Ferat bi kurdî axivîn. Di destpêkê de min şîrêke biçûk ji Cegerxwîn xwend:

Pa wek Cegerxwîn dîn nebî tu
Evîn di dil de şîn nebî
Tahlî bi te şîrîn nebî
Te bi wê zanînê çi kir...?

Ger ji jiyanê jinan bavêjin; wê jiyan bimire!. Ji helbestan, ji şîrân jinan bavêjin; ne şîr, ne hozan, ne çand dimîne; dinya pûc û vala dimîne. Û eger ku hûn bixwazîn hozanekî bê xençer û bê gule bikujin; wê demê jinan jêre qedexe bikin. Ew qirkirineke herî mezîn e. Lewre jin û jiyan bi hev re ne. Mîna heyy û roj, mîna rîh û can in. Hevaleke ku bi tirkî diaxivî - bi nezanîrastiyeke mezin anî ziman. Got, jin û jiyan yek in! Ew peyva wê ne çandî, ne edebî , ne mecazî û bi îmge bû. Rasterast digot.

Mijara wê programa zindî; li ser wan çalakiyên taflî bû. Jinan mora xwe li navendê xistibû. Ez li ser warê edebî beşdarî programê bûbûm. Ji bo wê yekê, ji bo wan hevalîn qehreman û dilpola min wiha got: "Ew çîrîskêni jîyanekî nû ne. Ew di dilê dijmin de teqîyan, gelê me hejandin!" Helbet wê rojekê romanîn wan, helbest û destanîn wan bîn nîvîsandin. Çîma di van çalakiyên mezin de mohra jinan, hevalîn dilovan hene? Bersiva min kin û kurt bû. Ji bo ku hevalîn jin, bêhtir azadiyê dixwazin!. Ji bo vê yekê jî pêgava yekemîn çalakiyên wan hevalan in!..

Gava ku mirov tî dînyayê ne di destê wî/wê de ye. Lî belê mirov kare biryar û querara mirina xwe bide. Ew mafekî azadiyê ye: Bi du awayan jîyanâ mirov tî betalkirin. Yekem; ji derve mudaxele çêdibe. Ew ne sixlekî rast û demokratî ye. Bê iradeya mirovan e. Ya duyemîn; mirov bi dilê xwe bi iradeya xwe querara xwe dide. Azadiya herî mezîn ev e. Lî belê, ger bi armanceke siyâşî, civatî û bi bîr û bawerîyê ilmî yên sosyalistî be, wê demê nabe întîxar, dibe tewreke şoreşgerî. Di dîroka însanetiye de gelek mînak hene. Prometûs, Spartakus, Brûno, Hallac-î Mansûr... û di dîroka şoreşî Kurdistanê de hemû şoreşgeren Kurdistanê, endam û çekdarîn PKK'ê hemû mînakîn mezin in. Em wan jî bi nav bikin; Kawayê hemdem Mazlûm, Kemal Pîr, Heyrî, Ferhat û hevalîn wan zarokên agîre azadî û şoreş... Zekiye, Rehşan û yên din in.

Eyşan

Hebû nebû, carekê ji caran rehme li dê û bavê guhdaran, ji xeynî axa, şex, zordest, mar û müşkên di quncikên diwaran de. Li pala çiyayekî bilind malbatek hebû. Di malekê de bav û dayik û keçikek dijiyan. Divê em çeleka wan jî ji bîr nekin. Navê keçikê Eyşan bû.

Konê xwe nêzî kaniyeke avzelal û sar danibûn. Dorhêla kaniyê şîn û ges bû. Cur bi cur kulîlk bi ba re dihejîyan. Her sibe û êvaran ji zinarêne mezin dengê rewêlek û sewalêne bi bask dihat. Ba dengê wan tevlihev dikir, dema di zinaran de olan dida, heyâ konê wan dibû kilameke bênav.

Dayikê êvaran sêpî li dar dixist, bi sarsimê mast dikila, bi dew nanê ji garris dixwarin. Ji bo wan kêfa herî mezin bi bayê hênik re vexwarina, çayê bû. Piştî vexwarina çayê keçikê serê xwe dida ser çongenê dayika xwe. Dayikê ji ji aliyeke ve teşî dirist, ji hêla din ve ji Eyşanê re çîrok digotin. Eyşanê yek şev bi çîroka mihê wîrze, yek şev bi çîroka Memê Alan, yek şev bi çîroka Sêvîn Xelatî re radiket.

Dema Eyşan radiket dayik û bavê wê, ji êşa diya Eyşanê re dilorand. Çiqas giya, çiqas pelgîn hebûn, çiqas ku'lîlk û gul hebûn baskên teyr û tûyan hebûn anîbûn lê ji êşa dayikê re nebûbûn derman.

Eyşanê her sibe çelek dibir çêrê, êvaran dadigeriya. Haya wê jî ji êşa dayika wê hebû. Her roj li newalan li daristanan, li banî û ziñaran kilam digotin. Ji ber sewta Eyşanê çelek ji bi ziman ket.

Dayik roj bi roj diheliya. Rojekê ji rojên biharê mir. Roj, hefte, meh û sal derbas dibûn. Bavê Eyşanê bi jinebiyekê re zewicî. Ne bi dilê Eyşanê bû. Keçikeke (dêmarî) jinbava Eyşanê ji hebû. Dêmarî yeka hesûd û çavnebar bû. Dilê wê wekî teniyê reş bû, pexîli li wê bûbû nexweşî. Eyşanê digel çeleka xwe jîna xwe ya rojane berdewam dikir. Rojekê dêmarî dibêje :

— Èdi keçika min bila çelekê bibe çêrê. Eyşanê hingika li çolê li ber tava xwes, li ber hewaya pak, li nav daristanan maye, ewqas xweşik bûye. Hineki ji bila keçika min bedew bibe.

Çelek di ser Eyşanê de dizivire û dibêje:

— Dil li xwe xera meke, bila keçika gemarî min bibe çêrê, ezê fenêñ cawa li wê bikim.

Li çolê çelek xwe vedisêre, dema keçik li wê digere çelek xwarina wê dixwe. Keçik heyâ êvarê birçî dimîne. Evarî dêmarî li rewşa keçika xwe diheyire. Keçik serpêhatiya xwe û çelekê ji dayika xwe re dibêje. Dêmarî dibêje:

— Hitil mitil (îlahîm) em çelekê serjê dikin. Çelek hê nehatiye serjêkirin ji



Eyşanê re wiha dibêje:

— Ku min serjê bîkin, tu hestiyen min bibe li binê dara xoxan veşere.

Çelekê serjê dikin. Lî ji xeynî Eyşanê kesî nedikarî goştê wê bixwe; goştê çelekê di devê kesan de dibû ziqûm. Eyşanê hestiyen çelekê di binê darê de vedişere. Çar roj derbas dibin, Eyşanê dihere dînihêre ku ji hestiyen hinek bûne tac, hinek bûne xêli û fistan, hinek ji bûne şekal. Eyşanê hew şekala hildide û dadigere.

Eyşanê êvarê satilê bi milê xwe ve dadiliqîne û diçe ser kaniyê.

Dema xwar dibe dişemite, şekalan wê dikevin bîra kaniyê. Pêxwas dadiğere kon. Lawê mîr hespê xwe fine ser kaniyê ku av bide, çavên wî li şekalan dikevin. Her şekaleke mîna heyyê dibî-

riqin. Lawê mîr li xwediye şekalan diğere.

Dêmarî keçika xwe dixemilîne, çavên wê kil dike, bangî lawê mîr dike :

— Ew xezala ku tu lê digerî ev e û ew ji mîna kewan li ser zinaran ji te re digazîne.

Ji ber vê xerabî û neqenciyê dîkek bi ziman dikeve û li lawê mîr dike hawar:

— Keçika xerab li hespê siwar e, Eyşana bedew a bejinzirav di tenûrê de zarezar e.

Lawê mîr baz dide, Eyşanê ji tenûrê derdixe, bi mirazê hev û din şad dibin.

Ew bi xweşiyê jiyan, hûn jî bimînin di xweşiyê de, jiyanek azad û dagirtî para we be, zarokên li welatê rojê û li hemû deveren cihanê.

BERHEVKAR: CİHAN ROJ

Tamandina dimsê

Yekî Surgucî diçe binxetê (Sûri), li gundekî bi qewlê du salan dibe şivan. Hejarî, şivanî û biyaniya wî ji ber têrnexwariya wî bûye. Gotin û dîtin nabe yek. Bi salixdana têrxwarina wî nîn bû. Rojê deh nanênen tenûrê dixwarin, dîsa jî birçî radiket. Serê sibehê sê nan hûr dikin nav şorbenîskê, nan û nînek jî pê re dixwar. Sê çar nan jî dixist tûrê xwe, bi xwe re dibrî çolê.

Rojekê yekî Serxetî (Omerî) ji bo firotinê barek dims dibe wî gundi. Li wê mala ku lehengê me yî şivan lê bû, barê xwe datîne. Ji xwediye malê distekê dixwaze.. Meşkek dims berdide distê, dema bi ser xanî dikeve dibêje: "Ha werin dimsê, ha werin dimsê!" Yê şivan diçe ser dista dimsê, dînihêre ku kodek mezin di nav de ye.

Hema kodê tije dims dike û bi ser xwe de dike. Eşkere dibe ku ji dimsê kêm bûye. Anglo dims çar tiliyan daketibü. Yê Omerî ji ser xanî dadiğere dibîne ku dimsâ distê gelek kêm bûye. Ji xwediya malê dipirse:

"Xwakê ma we hinek jê firotiye?" Xwediya malê dibêje: "Na." Dimsfiroş dibêje: "Qey çeleka we ketiye ser vexwariye?" Jinik dibêje: "Na." Dimsfiroş dibêje: "Va ye dims çar tiliyan daketiye, kêm bûye" Dibêjin: "Na wele me ne firotiye û ne jî dewarêne me vexwarine. Lî şivanekî me jê tamandiye. Tu bawer bike tiştekî din nîn e". Dimsfiroş: "Niha temandina şivanê we ev çend e? Dibêjin: "Erê". Yê Omerî matmayî dimîne û berê xwe dide şivan, dibêje: "Kuro madem tamandina te ev çend e, naxwe tu dikarî vê meşka dimsê giştî vexwî. Şivan: "Erê ez dikarim. De ka devê meşkê ji min re veke." Radibin devê meşkê vedikin. Yê şivan serê du salan e dims venexwariye. Zehf bêriya dimsê kiriye. Dilê wî li ser dimsê diqijiya. Şivan bi kêfxweşî tê ser meşkê, bi stikura wê digire, devê xwe dixe devê wê.

Çend qurçan lê dixe. Bêyî ku bêhna xwe berde, devê wî di devê meşkê de, bi destê xwe yê vala ji xwediye dimsê re işaret dike, angô dibêje, were, binê meşkê ji min re hilde ku ez wê vala bikim. Xwediye dimsê dînihêre ku meşk bi nîvî kir, heger destûra wî bide wê gişî vexwe. Malxo ji got şahid û şihûdê şivanê me hene, wele dimsâ te çû, wê giştî vexwe. Xwediye dimsê bi alîkariya Malxo devê şivan ji devê meşka dimsê derdixin. Yê Omerî dibêje: "Baweriya min hat ku şivanê we bes jê tamandiye. Min digot qey çelekê vexwariye."

BERHEVKAR: İ. OMERİ


Di zimanê kurdî de kovareke nû: Zend

Li çapemeniya kurdan, kovareke nû zêde bû. Ensîtuya Kurdî, dest bi weşana kovareke nû bi navê "Zend"ê kir. Ensîtuyê beriya niha jî du hejmarên Zendê yên ceribandinê weşandibûn. Ew diyar dikin ku di wan du hejmaran de gelek kêmasyîn wan ji aliye naverok û teşeyê ve hebûne. Ev kovar wê ji sê mehan carekê derkeve. Zend, kovareke lêkolîn û lêgerînê zanistî ye. Û kovar ji 96 rûpelan pêk tê.

Li ser navê "Mezopotamya Basın Yayın A.Ş." xwedîtiya kovarê Yıldız Gûltakin dike. Gerînendeyê Zendê û Berpirsê Karê Nivîsan jî Raif Yaman e. Di lijneya weşanê de jî, Serokê Esnîtuyê Şefik Beyaz, F. Huseyn Sağnîç, Felat Dilgeş û Edibe Şahin cih digirin.

Gerînendeyê kovarê Raif Yaman diyar dike ku, di nav kurdê bakur de, Kovara Zendê wê bibe yekemîn kovara zanistî û akademîk. Raif Yaman li ser vê mijarê, di kovarê de ev nivîsandine: "Armanca me ew e ku, em nivîsên zanyarên kurd ên ku dixwazin bi zimanê xwe yê maderî di warê pisporiya xwe de berhem bidin, û nivîsên bijarte yên li ser zanînê bi riya wergerê ji kovarê zanînê bigirin û bigîhîn xwendavanê Zendê. Em hemî zanyar, lêgerîner û lêkolînêrê kurd, nivîskarên xwe yên suristi dibînin."

Di hejmara yekemîn de hin ji nivîsên balkêş: Xeleka Dojehî (Medenî Ferho), Dîrok û Serpêhatiya Laşê Mirov (Şareza Aver), Karnameyî Erdeşîrî Babakan (Ehmed Şerîfi), Nérînek Li Salnamê (Feqî Huseyn Sağnîç), Çend Nuştey û Kitabê Kirdkî (J. Espar), Bingeha Çiroka Kurûk (Zeynelabidin Zinar), Di derbarê Mezopotamyayê de bibliyografya



Gernamîn Ewrûpiyan (Mehmet Bayrak), Di Hunerê de Teşe û Naverok (Süleyman Dañışman), Halet û têkiliyê civakî aboriyê kifş dikin (Hüseyin Deniz), Bazırganiya Çekan ya Navneteweyî û li ser tenduristî Kelija wê (WIKTOR W. SIDEL), Hewkarî dewletanî dagîrker (Cabbar Qadîr), Warê mirov ku der e? (Kuyaş Örs), Hunerê kirmanca de cayê kilaman-1 (Lerzan Jandil), Ziman û Rêberên Zimanzanîn (Çetin Özel), Çend Nîşe Li Ser Pêşveçünên fonolojîk ên di kurdî de (Hamid Mahamedî), Li ser alfaba kurdî (Raif Yaman), Di hiqûqa komara Tîrkiyê de dij Kurditî (Robin Rewsen), Bi nihîrînek gelempêri sinema (Yılmaz Keleş)

SERWÎSA ÇANDÊ

Komara Bokengeyan

FAYSAL DAĞLI



J i adetan e. Bûyerên girîng ku diqewimin, nivîskar pêwist e qelêma xwe li ser bileqîne. Emê jî wisa bikin û çend rêz li ser çeteyan û komara wan binexînin.

Bi rastî ev guftûgo êdî aciziyê didin mirov. Lewre ev halê hanê ji aliye ve me eyan bû. Û bi salan e, bi deh salan e ku, kurdê ku devê xwe vedike behsa van çeteyan dike û delîl û şahidên xwe bi nav dike. Heyhat, heta hêka genî neşikiya û bêhna pîs poz tije nekirin, deng ji kesî derneket.

Bila La Fontain bibore lê, vî çeteyî çîrokên wî anîn bîra min: Cahşîkek çavbelok, gûtekî har, kûçîkekî zincîrqe-

tandî, dêlikekî xenîmet û seroka wan dêlegureke zer. Ev mehlûq bibin qehremân û sermiyanê kê, malan wan ava dibe! Bi rastî mala tirkan ava kirine, ji bo axîreta wan jî dixebeitin. Ji bo me kurdan jî bêminetî ye, wekî Şemdîn dibêje: "Şer-e şer e, iro li meydanê şer e!"

Gotineke zanyaran heye: Miletik layiqî kîjan rejîmê be, leqayî wê tê." Ev rejîma kurdan nîn e, dijminê wan e. Lê bi salan e, bi deh salan e, di her hilbijartînê de careke din jî sandoqan ew dertê, qey ev jî nifirîn kurdan e. Heqê me li cem wan namîne!


Li ser rewşa koalîsyona dizan û komaran wan du pêkenok têr bîra min. Yek ji mekanbuhiş Apê Mûsa:

Kurê jînikê her dem nexweş e. Diya, wî bi destê wî digire dibe ba hekîm. Gava hekîm bala xwe didê, dibe niçe niça wî û li dora jînikê diçe û tê. Dibêje: "Xwe tazî bike û dirêj bike." Jinik bersiv dide: "Hekîm beg ê nexweş lawik e, ne ez im." Hekîm, "ez zanim,

Du Heval

Lee Tolstoy

DU HEVAL



Bawer dikim we hay jê heye ku Tolstoy romannivîsê mezin û navdar ê rûsî ye. İca we hay jê heye ku çîrokên geleki xweş jî, ji bo zarokan nivîsine.

Bi rastî haya min jê tunebû, heta ku min 16 çîrokên wî yên xweş xwendin, ku birêz Amed Tigris wergerandine li zimanê me.

Navê pirtûkê "Du Heval" e. Ev pirtûk di zimanê tirkî de bi navê "Qû" (Kugu), di zimanê swêdî de jî, dîsa bi navê "Du Heval" hatine wergerandin. Mixabin em navê wî yê orjinal ango yê rûsi nizanin. Birêz Tigris bi xwe jî ev nedaye zanîn, ji ber ku wî bi xwe orjinala pirtûkê bi dest nexistiye. Hûnê vêga bibêjin "nexwe wergera pirtûkê çawa çêbûye?" Tigris dide zanîn ku wî ev pirtûk ji zimanê tirkî wergerandiye û daye ber wergera swêdî jî. Lê xwezi jî orjinala wê hatibûya wergerandin.

Dema mirov tiştekî ji zimanekî kî werdigerîne zimanekî din, bi awayekî xwezayî hin tiş tênguhertin. Ji ber ku taybetiya her zimanî heye û tu bixwazî nexwazî tuyê hevokan hinek biguherînî, ji bo ku bidî fêmkirin. Lê dîsa jî dişê bête gotin ku xebateke bi vi rengî ya Amed Tigris, hêjayî pessîne ye.

Di vê pirtûkê de 16 çîrok, li ser 80 rûpelîn kaxiza spî, tevî resimîn bi çîrokan re eleqedar, hatine bicikirin.

Navê van çîrokan ev in: "Qû, Çêlika pisîkê, Kuvarikê keçika biçük, Dendikê hulîreshkê, Çûk, Virek, Du heval, Fil, Çûkê malan û dûvmeqesk, Eylo, Şerî û kûcik, Çûkê dafikan, Meymûn û lawik, Seavî, Gundî û kevirê bi qîmet, Hakimê bi edalet".

Ev pirtûk li Swêdê, ji aliye Weşanxaneya APEC'ê ve hatiye çapkirin.


Navîşana xwestinê:

Box: 3318, S-16303 Spâng/Sweden Tel: 08 - 761 81 18
NUR-HAYAT

lê tu cihê wî zixm nîn e, ji vî tu war çenabe. Baştır e em yekî din çêkin." Rewşa komara dizan jî wisan e. Pêwist e ji nû ve bê avakirin, lewre mirov destê xwe bavêje ku, dipelişê.

A din ji Mamoste Mehmet Şeker: Bokenge (kokarca) heywanekî genî ye. Tevî çêlikên xwe dijî. Diçin ku, heywanen din, ji wan direvin, an jî berî wan didin. Ji ber bêhna wan a pîs û gemara wan, dûrî wan diçin. Rojekê tevî çêlikan berê xwe dide daristanekê û erdê dikole, ji xwe re malikekê çêdike. Dema hatine her der heywan û nebat bûye, lê pişti ku wan konê xwe li wir daniye, cîranê wan tev reviyane. Tenê mane. Çêlik aciz bûne, ji bavê xwe re gotine: "Bavo kes li vir nema, em herin nav heywanan, em herin cihêkî din." Bokengeyê bav gotiye: "Heta ev qûn bi me re be, em herin ku jî, ewê wilo be."

Belê heta ew qûn bi sermiyanê vê komarê re be, ew bi heft avan jî paqî nabin.



Virêن bixelat

Di dema osmaniyan de li Rojhilata Navîn, bi tenê li pêsiya wan, pers hebûn. Herdem di navbera, osmaniyan û persan de, dubendî çêdibû. Rojekê mîrê persan û serokwezîrê osmanî têc cem hev û li ser dubendiya di navbera xwe de xebet didin. Osmanî dibêje: "Em mezin û xurt in". Mîrê împaratoriya persan ji dibêje: "Na em mezin in û ji we xurtir in." Serokê persan li rewşa "polîtikayê" osmanî dînihêre ku karê wan naçê serî, ji Serokwezîrê Osmanî re dibêje: "Were, em herin cem serokê ereban, kî ji me bêhtir viran bike, ew mezin e."

Serokwezîrê osmaniyan vê gotinê qebûl dike û dibêje: "Ev ji bo me tiştekî pêwist e". Radibin û diçin cem serokê ereban, derdê xwe jê re dibêjin. Serokê ereban dibêje: "Ev tiştekî girîng e, de ka kerem bikin kî ji we dê pêsiyê virê xwe bike." Yê pers dest bi virêن xwe dike, dibêje: "Cemaet baweriya we bila ji Xwedê be; dema hêrsa me tê, em li Helebê qîr dikin, mirov li Şamê ji denigê qîra me dimirin." Serokwezîrê Osmanî dikene, dibêje: "Ew qas bû vira te?" Serokê ere-

ban dibêje: "Malnekambax qey ne bes e." Serokwezîrê osmaniyan dibêje: "De ka ji kerema xwe re li min jî guhdarî bikin" û wiha didomîne "Cemaet baweriya we hebe. Dema em hatin Rojhilata Navîn, em ji ser piştä hespên xwe nedihatîn xwarê. Xwarina xwe jî me li ser piştä hespan dixwar. Em tim û tim digeriyan. Toza ji ber lingên hespên me bilind dibû, diçû ezmanan, roj tarî dikir. Em li hev civiyan ji bo paqîjkirina tavê, wezîrekî me, paçîkek hilda destê xwe, bi yek lotikê xwe gihand, pela tavê paqîj kir." Hê xeberdana serokwezîrê osmanî xelas nabe, serokwezîrê persan dike qîrîn, radibe ser xwe û dibêje: "Ka hûn çawa misilman in, derewen we ji misilmaniya we mezintir in." Belê iro ji em li rewşa medyaya Tirkiyeyê dînihêrin wekî meseleya osmaniyan û persan e. Rojname û televizyonê tîrkan ji bili derewan û berdevkiya artêş tu karî nakin.

Belê derewen osmaniyan û fêlên wan iro ji xwe di medyaya tîrkan de dixuye, ya ku pir viran dike dibe yekemîn...

SELMAN TIMUR

BIXELAT...

XACEPIRSA BIXELAT (43)

XACEPIRSA

Turkîstan Yer	R	G	Ü	C	M
BAL	I	N	D	E	K
P	A	L	E	A	Z
DELG	K			A	L
REALI	S	I	T		R
SISMAN	M	A	N	J	I
NER	E	R			
AF	S	E			
AN	Z	E	K		
ASUR	R	I			

PEYYA VEŞARI → SALVAGE GEAR

Bersiva Xacepirsa 41'an

Xacepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de ci bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 43'an pirtûka

Jack London

"ZAROKA ŞEVÊ" ye. Jérénöt:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn

"Peyva Veşarı" di navâ quitiyêni li bin xacepirse de binivisin û tevi adresa xwe ji me re bişinîn.

ZAROKA ŞEVÊ

Jack London



Diji rûniştinê Çûkeki xwende	Dohn, yax Püt	'Argon' Parlementera kurd (wêne)	Berevajî Nişanci	Sipartina tiştekî	Kesê ji mezhêbê Ali
3		Diji germê Çand bi 'erebi'			
Naveki meha (Adarê) Tazi		Denge, tewazin Arvan		Beyreq	
5	Hacet Yekemin		2	Xak	
Gîhane-kek	Navê kevin ê Agiri Exter			Nivîştin, razan Tevlihev	
Rêxiştineke nazîyan Strasyüm	Yara Memo Bazar				
	Xwerû, sade			Notayek	
Kûra kevîran Iridyüm		Dâcekek			
	Lewhe	1			

PEYYA VEŞARI →

PEYYA VEŞARI



1 2 3 4 5 6



Gelsên nûseriya kurdî

RAİF YAMAN

Nûseriya kurdî ya li bakurê welatê me demeke dîrokî diji. Ji ber xeletiyê xwe yên ku ji nezaniya kurdî tê, di nav tevliheviyeke mezin de ye. Li welatê xelkê mirovê ji rîzmanê xwe haydar nîn in, newêrin pênuşê bigirin destê xwe. Lî yên me; em dev ji rîzimên berdin, berî ku xwe hînî alfabetê bikin, bi alfabetê tirkî dest bi nûsimâ roman, helbest û nûsimâ cur bi cur dikin. Heta li gorî xwestina dilê xwe di nûsimandinê de bi kar tînin.

Haya wan ji pîvanê nivîsinê nîn e

Wekî tê zanîn guherînê wiha girîng heta ji aliyê saziyeke akademik ve neyîn pejirandin mafê tu kesî nîn e ku têxe pratikê. Pêşniyaz rast be ji, heta hemramaniyek neyî holê, mafê bikaranînê nade xwediye xwe. Hêj haya wan ji mantika bikaranîna zîmân nîn e, dest diavêjin wergera berhemên klasik ên edebiyata cihanê. Ji bo hînbûnê ji qet serê xwe naêşinîn. Haya wan ji pîvanê nivîsinê nîn e. Bi peyvîn kurdî tirkî dinivîsin. Gotinê pêsiyan û peyvîn xweser ên ku di kurdî û tirkî de tu aliyekî wan ê hempar nîn e ji, diwêrin peyv bi peyv wergerînîn zîmanê me.

Ev rastiyê piraniya rewşenbîrê kurmancî û kurmancî bakurî ne. Ev

rewşenbîrê me bi nezanî be ji, bi navê zengîkirina kurdî, mala kurdî wêran dikin. Her kes mecbûr nîn e bibe nivîskar. Bila pêsiyê hinekî bixwînin, zîmanê xwe hîn bibin.

Mirov ji kîjan nîjad, netewe an ji gelî dibe bila be, nivîsena wî ya edebî bi zîmanê wî yê nûsimâ diyar dibe. Ev di zanîna edebiyatê de pîvanekî gerdûnî ye. Bila der barê nûserî û wergêriyê de xwe hinekî bigîhînin û pişt re pênuşê bigirin destê xwe. Ev ji ew qas karekî dijwar nîn e. Divê êdî nivîskarê kurdî, ji bo lêborînê xwe nespêre rastiya civakî ya gelî. Ev zirx tenê xwediye xwe têk nabe; zirareke mezin ji, dide zîmanê xwendevanê xwe.

Gelşa alfabetê

Bi kurtahî be ji me gelsên nûserên kurd ên ku bi kurmancî û kirmancî dinûsin, anîn zîmân. Nûserên kurd ên ji başûr û rojhilatê welatê me ne û bi soranî dinûsin di warê bikaranîna kurdî de gelek bi pêş ve çûne. Ji ber ku nivîsarê xwe hêj bi alfabetê erebî dinûsin li gelşa zaraveyî, ya alfabetî ji zêde dikin û xwendin û têgihîstina berhemên xwe dijwartir dikin.

Em gelşa zaraveyî deyîn aliyeke, ev rastiya me ya tehl ji bo kurdê li ser axa Sovyeta kevn dijîn ji, hêj hebûna xwe didomîne. Ji bo xwendina berhemên wan ên bi kurmancî ji, bi deh hezaran xwendevanê kurmancî mecbûr dimînin ku alfabetê kirîlî hîn bibin.

Rewşenbîrê kurdistanî yên ku bi kurdî an ji bi tirkî di warê akademik de bi nivîsarê xwe tên naskirin, xwedî hinek tevliheviyê hempar in. Di nav van de kurd, tirk û yên gel û neteweyê cihêreg hene. Di nav me kurdê bakurî de, têgihîn zanistî zehf erzan bûne. Mirov ku li ser dîrokê çend rûpel nivîs an ji kitêbekê dînivîse, dibe zîmanzan. Nivîsarê wan zanistî ne, anîn in, ji bo rewşenbîrê bakurî hema hema hêjahiya xwe winda kiriye.

Bêsazibûn

Divê êdî em kurd ji, zanibin têgihîn zanistî di cihêwan de rast bi kar bînin. Dema ku em her kesî li gorî zanîna wan rast bi nav bikin, em dê karibin zêdetir bi pêş bikevin. Ji bo pêşketinê riyekî din nîn e.

Gelş, kemasî, tevlihevî, nezanî û gelek nebaşiyê din ên civakî ji kaniya bêpergaliyê hiltê. Ji kanên bêpergaliyê yên herî girîng yek bêguman bêsazibûn e.

Gelê me ji ber sebebê ramyarî yên ku ji her kesî ve diyar in, di vî warî de ji, zehf dereng maye. Ji ber vê yekê pêwistiya rêkxistibûnê zêdetir hîs dike. Divê saziye me yên akademik, li ser xebatê xwe yên zor pêwist, zêdetir bixebeitin û bi karênen xwe van rastiyê ku di sedsala me de li tu komek mirovahiyê nayen roj bi roj kêmîtir bikin, ta ku rojekê bi temamî ji holê rabin.

WELAT
Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yaynçılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayin Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayin Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMÎ TAN
RAHMÎ BATUR

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazi İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım

NÜNERİTYÂN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewrûpâye:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helim Yûsîv
963-21-960099
Berlin:

Silêman Sido
49-30-69002695

Hannover:
Selîm Biçük
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670834
Bruksel:

Medenî Ferho
32-02-466037
Stockholm:

Robîn Rewşen
46-8-7510564
Bonn:

Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49
Celle:

Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Roja danîna hîmê şoreşa kurd

**Li ser rûyê cihanê kêm
rêxistin di demeke
ew qas kurt de gîhiştine
vê hêzê. Ev 13 sal in,
gerila li hemberî teknika
modern bi Tirkîyeyê re şer
dike. Bi panzerên alman,
bi skorskiyên fransiz,
bi kobra û bombeyên
mîsketê yên amerîkayê re
şer dike. Dewletê ji bo
qedandina PKK'ê temenê
sê mehan, şes mehan
datîne, lê ew her diçe
xurt dibe, di nav gel de
reh û riç ber dide.**

Partiya Karkerê Kurdistanê (PKK) tam 18 sal berê bi pêşengiya Abdullah Öcalan, di 27'ê sermawea 1978'an de li gundê Fisê ya li Liceya Amedê, hate avakirin. Li ser rûyê cihanê kêm rêxistin di demeke ew qas kurt de gîhiştine vê hêzê. Ev 13 sal in, gerila li hemberî teknika modern bi Tirkîyeyê re şer dike.

Pêşengên PKK'ê, di sala 1973'an de bi fikra Abdullah Öcalan li Enqereyê bîryara avakirina rêxistîneke siyasi dan û UKO (Ulusal Kurtuluş Ordusu) damezirandin, yanê Artêşa Rizgariya Neteweyi. Vê rêxistinê heta salê 1976'an li Kurdistanê xebatê xwe yên siyasi û perwerdehî domandan. Pişti ku ji avakarê Komîteya Navêndî Haki Karer, di 18'ê gulana 1977'an de hate kuştin, rêxistîneke kongreya xwe ya yeke-mîn li Liceya Amedê li dar xist. Di kongreyê de navê rêxistîneke hate guhertin, UKO bû PKK yanê Partiya Karkerê Kurdistanê.

Di wan salan de rewşa Tirkîyeyê ya siyasi pir tevlihev bû, faşistan her roj li deve-reke Kurdistanê qetîfam pêk dianîn. Berî cüntayê bi salekê, ji bo ku rêxistin xebatê xwe yên siyasi û perwerdehî baş pêk bîne, rîveberiya PKK'ê derkete derveyî welêt. Abdullah Öcalan û hin rîberên PKK'ê çûne Bekayê. Bi darbeya 12'ê rezberê re, ji rîberên PKK'ê pir kes hatine girtin.

Di Zindana Amedê de ji pêşengên PKK'ê Mazlum Doğan, di 21'ê adara 1982'an de, ji bo ku serî li ber dijmin netewîne xwe şewitand. Pişti Mazlum Doğan,



Hayri Durmuş, Kemal Pir, Akif Yılmaz û Ali Çiçek bi rojiya mirinê ji kurdan re bûne mînanakên serhildan û berxwedanê.

PKK'ê li ser van bûyeran, di navbera 20 - 25'ê gelawêja 1982'an de kongreya xwe ya duymîn li dar xist. Di vê kongreyê de bîryara şerê çekdarî hate girtin. Di kongreyê de Hêzên Rizgariya Kurdistanê (HRK) jî hate avakirin, ev ji baskê partiyê yê leşkerî bû. Bi avakirina HRK'ê re, di 15'ê Gelawêja 1984'an de şerê çekdarî dest pê kir.

Xurtbûna di demeke kurt de

Bi şerê gerila re, li her deverê Kurdistanê vejîneke nû dest pê kir. Gelê kurd ê di bin zilmê de, bawerî bi şerê gerila anî. Li hêla din PKK'ê jî ev bawerî dida gel. Di demeke kurt de PKK li bakurê Kurdistanê bû hêza herî mezin. Ev jî ji ber disiplîna kadroyen wê û jêhatibûna wê ya di warê bikaranîna taktikên li gorî pêşveçûnên siyasi bû.

Her roj taktikên şer, taktikên siyasi yên nû dihatin afirandin. Digel kadroyan, parti jî her tim xwe nû dikir. Di sala 1985'an de Cepheya xwe ya siyasi jî ava kir bi navê Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê (ERNK).

Pişti ku di 28'ê adara 1986'an de fermadarê HRK'ê Mahsûn Korkmaz li Çiyyâye Gebarê şehîd dikeve, di kongreya sêyemîn (25-30'ê kewçera 1986'an) de Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê (ARGK) tê damezirandin.

Li aliye din gelê kurd bi her awayî ali-

karî û piştgiriya PKK'ê dikir. Edî li pir devêrên Kurdistanê wekî Cizîr, Dihê, Şîrnex û Nisêbînê serhildanen girseyî pêk dihatin, PKK balafirên dewletê dixistin xwarê û her tişti ji PKK'ê dihate pirsîn.

Şerê gerila Tirkîyeyê xiste tengiyê, hem ji aliye aborî û hem ji aliye siyasi ve. Digel vê PKK'ê dengê doza gelê kurd gîhande cihanê. Di vê, rewşê de, PKK aliye xwe yê aşîtxwaziyê jî derxiste holê û di 1993'an de yekemîn car agirbest ilan kir.

Lê dewleta tirk bersiv neda agirbestê û ji bo ku li hemberî PKK'ê şer bidomîne dev ji berjewendiyen xwe yên li Rojavayê berda. Tirkîye nikaribû bi çekên xwe bi PKK'ê re şer bike, îcar şerê teknik dest pê kir. Edî PKK bi panzerên alman, bi skorskiyên fransiz, bi kobra û bombeyên mîsketê yên amerîkayê re şer dikir. Dewletê ji bo qedandina PKK'ê temenê sê mehan, şes mehan datani, lê tu encam jî nedistand.

Dewlet bi vê jî nema, gund dişewitan-din, bi milyonan mirov ji cih û warêne xwe hatin koçkirin, li herêmê nêzîkî çar hezar cînayetên faîli meçhûl pêk anîn û bi sedan kes hatin windakirin. Li Tirkîyeyê jî rojnameyên ku rastiya şer danîn berçavan hatin bombekirin û girtin. Bi dehan kes wîndabûn, bi dehan kes li navrojê, li ber çavêne mirovan hatin kuştin.

Li hemberî van bûyeran PKK'ê dîsa şerê gerîlatiyê domand û bi her kesi jî da isbaşkirin ku PKK naqede. Her wiha aşîtxwaziyê xwe careke din derxiste pêş û di 15'ê berfanbara 1995'an de careke din agirbesteke din ilan kir. Bi vê agirbestê ji dewleta tirk careke din deşifre bû ku aştiyê

ji bo kurdan naxwaze. Li hêla din şerê taybet bingeha dewletê rizand, hem ji aliye aborî û hem jî ji aliye exlaqî ve. Her roj çeteyen ku di nav dewletê de ne, bi bûyeren tesaduf deşifre dibin.

Bandora PKK'ê li ser çand û hunera kurdî

Ji avahûna komara tirk bigire heta sala 1992'an, bi zimapê kurdî nîvîsandin û axastin qedexe bû. Dewleta tirk ji mecbûri di sala 1992'an de bi sinor be jî, bikaramîna zimanê kurdî serbest kir. Bi vê azadiya ne ji dil, kurdan dest bi xebatênu ku çand û hunera kurdî derxin ronyê, kir.

Rojnameyên bi kurdî, enstitü û naven-dîn çandî hatin avakirin. Lî wan jî para xwe ji pest û pêkutiyen girtin, bi dehan rojnameyanen kurd hatin kuştin û bi dehan hatin girtin, sîrgûnkin, ji ber ku şexsiyeta kurdî ji nû ve diafirandin. Her wiha rewşenbiran li hemberî tehdeyên dewletê dev ji xebatê xwe beranedan, ên li welêt û li Tirkîyeyê pirtûkên kurdî nîvîsandin, li ser çanda kurdî, muzîka kurdî, dîroka kurdî xebat kiri. Yen li derveyî welat jî bi dehan saziyên kurdî ava kirin. Ji Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat (PKDW) bigire heta televîzyona kurdî MED-TV'ye bi ked û xebatê xwe yên bi rûmet damezirandin.

Pişti 18 salan sistema Tirkîyeyê ku bingeha wê li ser pest û pêkutiyen ava bûye, deşkere bû. Gelê kurd di merhaleyn nû re erbas bû, bû xwendî bir û bawerî û şexsiyeteke nûjen.

METİN AKSOY